

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

PAYÎZA 2005an

“... Ma di vê rewşê de, Luksemburga ku nifûsa wê 450 hezar e biryar li ser çarenûsiya 40 mîlyon kurdî nade? Li vir bêadaletî tune? Ma di van têkîliyan de exlaqê sîyasî heye? Ev dijberî çima wek brûskeki li serê kurdan naxe û jê zingînî dernaxe.”

28

Îsmaîl Beşikçi

bîrnebûn, hejmar 28, payîza 2005an

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve/Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 28, payîza 2005an

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikaili, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnîşana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya

Tel: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2 500 000 TL.

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln

BIC: DEUTDEDBKOE

IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00

Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tel: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 a

Polatlı-Ankara

Tel.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı


Apec-Tryck AB



Roja gundê Omê li Almayayê

Her nivîskar berpîrsiyarê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê
re tîn, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî,
li xwedî nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela
Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wêneya berg: Ali Çiftçi

- 2 Divê kurd daxwaza mafên xwe yên carenûsî bikin! *Ali Çiftçi*
- 4 Nûçên civakî, *H. Atmaca, Ö. Yüce, R. Zelalxwîn, Î. Türkmen, K. Harımcı*
- 13 Hevpeyvînek bi mamoste Îsmail Beşikçi re, *Wergera ji Tirkî: Amed Tîgrîs*
- 18 Xwîna me yek e!.., *Îrfanê Mala Karê*
- 21 Gera serokwezîrê Tirkîyê R. Tayyip Erdoğan ya Amedê, *Nebî Kesen*
- 26 Li peyî nifşeke şoreşgerên bê ziman, nifşeke bi ziman hewce ye, *Memo Şahîn*
- 28 Ez li Anatoliya Navîn bûm, *Muzaffer Özgür*
- 35 Bê zimanî û dil-xatir, *Mem Xelîkan*
- 38 Stiranên gelerî, *Berhevkar: M. Xelîkan*
- 41 Hevpeyvînek bi serokê Karawitt e. V. Tahsin Demirsoy re, *Muzaffer Özgür*
- 45 Axa û keçika xwe ya bi deq, *Berhevkar: Ecevit Yildirim*
- 51 Tesîra barkirinê li ser zimanê kurdên Anatoliya Navîn -I-, *Nuh Ateş*
- 55 Bi hunermend Serbulent Kanat re hevpeyvînek, *Robîn Rewşen û Amed Tîgrîs*
- 61 Sosyolog ve Türk aydını İsmail Beşikçi ile bir söyleşi, *Ali Çiftçi, Lewent Kanat*
- 67 Anadolu`ya ilk gelen Kürtler, *Amed Tîgrîs*
- 70 Kürt Alişan beyin Torunları, *Dr Mikaili*
- 77 Elbistan - Pazarçık Yöre Tarihi ve Kültürü Üstüne -1-, *Mehmet Bayrak*
- 87 Mektup /şiir, *Ömer Faruk Hatipoğlu*
- 91 Fatma, *Seyfi Doğan*
- 92 Zimanê kurdî, *Murad Ciwan*

Divê kurd daxwaza mafên xwe yên carenûsî bikin!

Xwendevavên birêz, di vê hejmara payizê de wek tema nebe jî, bi giranî nivîs li ser rewşa zimanî kurdî ne. Ev jî helbet ji rewşa me ya ku em îro dijîn tê. Di mehên payizê de her ku diçe roj kin dibin û em ber bi tarîtiyê we diçin. Tarîti jî bi xwe re hinek diltengiyê tîne. Lê em ê dilê we teng nekin. Bi hêviya ku di wan rojên pêş me yên şevdirêj de, hûn ê bi dilekî ferah û şad nivîsên li gor dilê xwe, bixwînin. Ji ber di ev rojên tarî de, hevesa xwendinê jî pir dibe.

A niha pêve, li Tirkîyê rewşeka nû, piştî îmzekirina protokola danûstendina resmîya di navbera Tirkîyê û YE, ji bo endametiya Tirkîyê, destpêdike. Di 3ê cotmehê de, li Luxemburgê, bi beşdariya heyeta Tirkîyê, di bin serokatiya wezîrê derve, Abdullah Gül ve hat îmze kirin.

Ev bi xwe re guhartinên nû li Tirkîyê tîne. Ji aliyê aborî, siyasî û edaletê de divê gavên nû yên berbiçav bîn avêtin. Di vê prosesa nû de, ji bo rewşenbîr û rêberên kurdan jî erkên nû yên dîrokî derdikevin pêş!

Gelo çî ne ew erk? Bi ya min divê niha hîn bi organize û hevkarîyeka berfireh, mafên çarenûsî yên gelê kurd ji dewleta Tirkîyê bêt xwestin û ji bo destxistina hemû mafên xwe yên însanî, hevkarîyeka berfireh ya hemû rêxistinên siyasî, civakî û çandî pêwîst e!

Di ev sedsala 21an de ku hîn jî zarokên kurdan ji bo kesayetiya xwe, ji ber zimanê xwe, li Tirkîyê jî aliyê mamostên xwe ve, bi politikayeka zanistî ya resmî ya dewletê ve biçûk tîn dîtin û kesayetiya wan tê şikestandin. Ew rûreşîya Tirkîyê divê hêdî

derkeve rojevê. Vê jî divê xelkê me bi xwe bike. Bila baş bêt zanîn, ku tu kes ji derve nayê û bi piyê me ra nagrê û nabê; ka werin ev jî mafê we ye, fermo! Na, divê vî karî xwe jî em nekin hustiyê hinekên din!

Divê ji niha de, hemû malbatên kurdan bîn mobîlîzekerin ku heqê wan heye, ji dewletê û ji YE daxweza mafên xwe yên carenûsî bikin. Ew ziman, çand û folklorê ku jê hatine stendin/wendakirin ji bo ku paşde werbigrên, jê ra îmkan bîn dayin!

Îsmail Beşikçi, navekî ji bo we ne nenas e. Me vê havînê bi birêz mamoste Îsmail Beşikçi re, li Anqerê hevpeyvînek kir. Me ji bo we xwendevanên hêja ev sohbeta hem bi zimanê kurdî û hem jî bi zimanê tirkî di vê hejmarê belav kir. Kurdiya we jî, ji teref Amed Tîgrîs ve hatiye amede kirin.

Birêz mamoste Îsmail Beşikçi di vî hevpeyvînê de giranî li ser rewşa kurdî disekine û dixwaze bala kurdan bikişîne ser parastin û xwedî derketina zimanê kurdî ku îro li Tirkîyê li ber wendabuyîna ye.

Bi sernivîsa *Gera serokwezîrê Tirkîyê R. Tayyip Erdogan ya Amedê* jî qelesa birêz Nebî Kesen hûn dê gotareka balkêş bixwînin. Birêz Kesen di vê gotara xwe de bal dikêşîne ser gotinên serokwezîrê Tirkîyê û dide nişandin ku ew di dîroka Tirkîyê ya resmî, de cara yekê ye ku serokwezîrêk bi resmî, mesela kurd tîne rojevê û dibê; *ew problem problema kurdan tenê nîne ya me ye jî*. Ew helbet ne ku meselê bi tevayî qebûl dike, lê destpêka proseseka nû ye.

Emekdar û endamê redeksiyona me, birêz Muzaffer Özgür piştî demeke dîrû-dirêj, li derveyê welêt cara yekê, havîna îsal

wegerî welêt. Bi sernivîsa *Ez li Anatoliya Navîn bûm* hûn dê gernameya wî bi heyecan bixwînin. Birêz Muzaffer di vê kurtegernameya xwe de hestên xwe yên netewî û çavlênêrînen xwe bi zimanekî hêsan nivîsandiyê.

Bê zimanî û dil-xatir Mem xelikan çavdêriyek bi zarava xelikan nivîsiye. Çavdêriyeka di çend aliyan de balkêş e, ji ber edet û dîtînen ne wek hev, dema rastê hev tîn, ku ji hev re nenas bin, ci ecêb tîn serê meriv...

Axa û keçika xwe ya bi deq ji folklor kurdî hûn ê ji pênûsa Ecevit Yildirim bixwînin. Birêz Ecevit Yildirim ev çîroka ji gundê Celika/Yeşilyurtê berhevkeriyê û bi zimane-kî xweş nivîsiye. Ev nivîsa birêz Ecevit, bi rastî ciyê gotinêye ku bêt pesinandin. Ji ber nivîsa xwe bê çewtî û bi rêzimanîyeka bi rêkûpêk, li gor qeydeyên berhevkeriya folklorîk nivîsiye. Yanê, hem zimanê xwe serrast nivîsiye û hem jî zarava û gotinên ku hêla çîrok jê berhevkeriyê re sadiq ma ye. Em li vir careka din spasiya birêz Ecevit Yildirim dikin, ji ber nivîsandina wî ya bi zimanê kurdî ku bi xwe yek ji wan kurdînivîsarê me yê xort e.

Tesîra barkirinê li ser zimanê kurdên Anatoliya Navîn gotareka birêz Nuh Ateş ku kurdên Anatoliya Navîn bi hatina xwe ya Anatoliyê re çawa zimanê xwe pêşxistine, li gund û bajarên bi karanîne û heta roja îro anîne.

Bi hunermend Serbulent Kanat re hevpeyvînek ji aliyê Mamoste Amed Tigrîs û Robîn Rewşen ve hatiye kirin. Birêz Serbulent di vê hevpeyvîne de li ser karê xwe yê berhevkerina folklorê kurdî û dîtînen xwe yên di derbarê çanda kurdî de, agahdariyên balkêş dide.

Bi sernivîsa *Anadolu'ya ilk gelen Kürtler* birêz Amed Tigrîs nivîseka bi zimanê tirkî li ser kitêba Andrew Collins, ya bi navê *From the Ashes of Angels The Forbidden Legacy of a Fallen Race*. Tirkiya wê *Meleklerin Küllerinde Gunahkar bir irkin yasaklanmış mirası* ku bi tirkî jî

aliyê weşanxana Avesta ve hat weşandin, nivîsiye. Birêz Amed Tigrîs beşeka ji kitêba ku bahsa kurdên Anatoliya Navîn dike, bi pêşgotinekê nivîsiye.

Bi sernivîsa Kürt Alişan Beyin torinlari birêz Dr Mikailî hevpeyvînek bi torinên Kürt Alişan Bey re kiriye. Dildixwest ev hevpeyvîna ji ber qerekerê xwe, bi kurdi kiriba, ji ber gotinên wî kalî rûspî, dê rengêka din bida vê hevpeyvîne!..

Elbistan-Pazarcık yöre tarihi ve kültürü üstüne-Mahalli Tarih ve Kültürün Önemi ji aliyê birêz Mehmet Bayrak ve hatiye amade kirin. Lêkolîneka dîrokî-çandî ya balkêş e. Birêz Mehmet Bayrak wek her hejmarê kovarê, ev hejmar jî bi vê lêkolîna xwe dewlementir kir.

Di koşeya bi navê *zimanê kurdî* ji pênûsa birêz Murad Ciwan, bi sernivîsa *Cînav*, hûn ê dersên kurdî bibînin.

Li vir dixwazim bala kurdên me yên ji Anatoliya Navîn ku bi kurdî dinivîsinin bikşînim ser çend xalan: Piştî ku danûstendin di navbera kurdên Anatoliyê û yên ji bajarên Kurdistanê çêbûn, di zimanê rojanê de jî, ji hevdû gotin fêrbûn, heta di dengkirinên rojane de, em car car dibînin ku kurdên ji Anatoliya Navîn, hinek gotinên nû, ku ji heval an nasên xwe yên ji Kurdistanê hatine, fêrbûne rast an çewt bi kar tînin.

Ji hev gotin fêrbûn helbet ne tişteki çewt e, lê em dibînin ku hinek nivîskarên ji kurdên Anatoliyê ku nû dest bi nivîsandinê kirine, her gotinên ku ji kurdên ji bajarên Kurdistanê bihîstine, rast dizanin û di nivîsên xwe de jî bi kar tînin. Wek mînak; di şûna gotina *dawestî (rawestî)* de *sekinî*, di şûna gotina *dengkirin* de *xeberdan*, di şûna *pêşbirik* de *lec*, di şûna *veng/weng/wisa* de *wilo* û.h.d. pir gotinên din hene ku bi kar tînin. Gotinên wek *xeberdan*, *sekinî*, *lec* ji zimanê erebî hatine û gotina *wilo* jî du-sê qezayên Mêrdîn, Qamişlo û Amûdê bi kar tînin. *Dengkirin*, *dawestandîn* û *pêşbirik* xwerû bi kurdî ne.

Heta hejmareka din bimînin di xêr û xweşiyê de!

Roja gundê Omê li bajarê Uhingenê



Hemî Atmaca

Komela gundîyên gundê Omê, yên li derveyî welêt ku li Almanyayê dijîn a bi navê VALM'ê, di 28ê meha gulanê(28.05.2005) de li bajarê Uhingenê rojêke şahî û hevnasandinê pêk anî. Armanca vê rojê pekanîna hevkarî û

yêkitiya gundiyan ji gundê Omê yên li derveyî welêt bû. Xelkê ku ji bajarên Ewropayê û yên Almanyayê hatibûn, di bin germeke 30 derece de, li der ve bi aktiviteyan sporê, muzik û kilamên ji herêma Anatoliyê yên folklorî, rojêke bi kêf û xweş derbas kirin. Bi beşdariya hunermend, Bilal Ercan, dehol û zirne û hunermendên din yên ji herêma Anatoliyê, ev roja bi aktiviteyan zarokan ve şahîyê serkeftî bû.

Di dawîya vê roja de, li ser girîngiya vê roja hat dengkirin û ji bo berdewamiya vê jî ji bo sala tê li Avusturyayê bibe, biryar hat stendin.



Dîmenek ji roja gundê Omê li Almanyayê

Wêne: Hemî Atmaca

Aksaray Kürtleri Hollanda'nın Beverwijk kentinde dernek açtılar

AMSTERDAM (28.06.2005)

Hollanda'nın Beverwijk kentinde yaşayan Aksaray Kürtleri, Ekecik Kültür Derneği adı altında birleştiler.

Hollanda'nın değişik kentlerinde yaşayan Orta Anadolu Kürtleri geçtiğimiz gün Beverwijk kentinde ilk derneklerini açtılar. Saat 14:30 da Dilan düğün salonunda bir araya gelen yaklaşık 150 kişi ilk dernek açılışını kutladılar.

Derneğin açılışını 1986 yılında Almanya'nın Köln kentinde yapılan Kur'an-ı Kerim yarışmasında Avrupa birincisi seçilen Reşit Hoca'nın Kur'an-ı Kerim okumasıyla başladı. Kur'an-ı Kerim ardından Reşit Hoca kürçe söylediği ilahilerle salondaki misafirlere duygulu anlar yaşattı.

Reşit Hoca'nın ardından dernek yönetimi adına bir konuşma yapan Mehmet Koca da şunları dile getirdi. "Bizler aslında ikinci göçü yaşıyoruz, bu bizim 30 yıllık göçümüzdür. Bu derneği açmakla bir nevi 30 yıllık hasrete son verdik. İnsanın kendi gerçeğine sahip çıkması ve koruması kadar güzel birşey yoktur." diye belirtti.

Ekecik Federasyon başkanı Seyit Keskin yaptığı konuşmada yoğun bir mücadele sonucu Aksaray Kürtlerinin ilk derneklerine kavuştuklarını belirterek, kendilerine destek veren Aksaray



Kürtlerine ve dostlarına teşekkürlerini ilettiler. Keskin, "Yüz yıllar önce Kürdistan'dan Aksaray'a sürgün edilen Aksaray Kürtlerinin yeniden kurumlaşma vesilesiyle öze dönüş coşkusu da beraberinde getirmiştir. Egemen sınıflar ve sömürgeci güçler bizleri inkar ve asimile ederek yok edeceklerini zannettiler, ama



bizler bugün burada dilimize, kültürümüze bağlılığımızla kendimizi bir kez daha ispat ediyoruz ki, bizleri asimile edemeyenler bundan sonra da edemezler” açıklamasında bulunarak, değerlerle yaratılan Kürt kurumlarına daha çok sahip çıkılması çağrısında bulundu.

Keskin, Ekecik Kültür Derneği olarak temel projelerimiz arasında kendi özümüze bağlı kalarak dernek ve federasyonumuzu yüceltmek ana hedefimiz olacaktır. “Aksaray Kürtlerini toplayarak kendi özüne dönüştürmeyi hedeflediklerini belirtti.

Hilkecik-Online adına Rêmê Hilkecikê ise yaptığı konuşmada, Avrupa'nın bir çok ülkesinde yaşayan Aksaray Kürt gençliği kendi özüne ve kimliğine sahip çıkması gerektiğini belirterek, Kürt gençleri gelişen teknoloji dünyasında kendi kültür ve değerlerine sahip çıkarak kendilerini eğitmelerini istedi.

Avusturya Kürt Dernekleri Federasyon (FEYKOM) adına Yönetim Kurulu Üyesi Ömer Yüce ise yaptığı konuşmada, Aksaray Kürtleri açısından ilk olan “Aksaray Ekecik Kültür Derneği” kurulması başta Aksaray Kürtleri olmak üzere Hollanda`da bulu-

nan tüm Kürtleri sevindirdiğini belirterek, Aksaray Kürterinin sosyal, kültür ve tarihine katkıda bulunacağına söyledi.

Böyle bir süreçte Aksaray Kürtlerinin kurumlaşarak kendi değerlerine sahip çıkmasının çok önemli olduğunu dile getiren Yüce, “Yıllarca devletin bilinçli politikaları sonucu Aksaray Kürtlerinin kaderi de diğer Kürtler`den pek farklı değildir. Devletin bilinçli asimile politikaları hep gündemlerine girmiştir. Siyasi iktidarların rant kavgaları nedeniyle ciddi sorunlar yaşamış, işsizlik ve yoksulluk köy sakinlerine zor yıllar yaşatmıştır” dedi.

Derneğin açılışına katılan Aksaray kürterlerinden olan Ozan Harun Kılıç ve Ozan Cemal söyledikleri kürtçe parçalarla, kitleyi çektikleri halaylar eşliğinde çoşturdular. Grup Mega`nında sahne alıp seslendirdiği parçaların ardından, Güney Kürdistan`lı olan Ellend sahne aldı. Kürtçe seslendirdiği güzel parçalarıyla kitleye keyifli bir müzik ziyafeti verdi.

Derneğin açılışına Beverwijk belediye meclis üyelerinin yanı sıra sivil toplum örgüt temsilcileri de katıldı.

Rojnama Peyama Kurd ya hefteyî ku li derveyî welêt li Almanyayê derdikeve, meha çûyî yek saliya xwe bi kokteylekê pîroz kir.

Peyama Kurd ya hefteyî bi zimanê kurdî di hundirê salekê de xizmeteka giranbiha ji bo pêşketin û berfirehkirina ziman û çanda kurdî, li derweyî welêt kir. Herwiha em yeksaliya rojnamê ji bo xebatkarên wê serkeftineke hêja dibînin û kar û xebatên wan yên pêş de pêşketin û berdewamiya kovarê ji dil dixwazin.



Ji aliyê Belediya Karacadaxê ve li 15 Hazîrana 2005an pêşbirika futbolê hat lidarxistin



Pêşbirik di navbera 16 komên ku girêdayî 13 gund û navçeyên Kulu û Cihanbeylî de çêbû. Komên ku tevlê pêşbirika futbola ku bi slogana „ji bo pêşvabirina hevaltî û biratî“ bûyî ew in:

Karacadağ Belediye Spor
Karacadağ Gençlik Spor
Kırkpınar Belediye Spor
Kırkpınar Gençlik Spor
Celep Belediye Spor
Yeniceoba Belediye Spor
Kuşa Belediye Spor

Kulu Gençlik Spor
 Kulu Beyza Gümüşcülük Spor
 Arşını Spor
 Yeşilyurt Spor
 Çöl Yaylası Spor
 Beşkardeş Gold Spor
 Bozan Spor
 Tuzyaka Ömeroğlu Spor
 Büyük Beşkavak Belediye Spor



Dema xelat dayînê

Pêşbirik ji listikên maçên nivfînalê ya roja 18 Hezîran 2005an bi şunve, roja 22 Hezîran 2005an bi maça fînalê ya di navbera komên Karacadağ Belediye Spor û Yeniceoba Spor ve bi davî bû. Di maça fînalê de Karacadağ Belediye

Spor li hemberî Yeniceoba Sporê bi encameke 8a re 4 bi ser ket û bû yekemîn.



Dîmenek ji xelat dayînê

Li gûndê Şereflîyê pirtûkxane û konaxa muxtarîyê vebûn

Di 13ê temûza 2005an de, li gundê Şereflîyê heyecaneke mezin hebû. Berpirsîyarên Komela gundê Şereflîyê SERDERÊ û Heyeta muxtarîyê hazirîyê xwe xelaskiribûn û benda mêvanên xwe bûn. Di dîroka gund de cara yekemîn bû. Gundî kefxweş û berpirsîyar di heyecanê de bûn.

Berpirsîyarê komelê û heyeta Muxtêr teleşe dikirin ku malhazirî baş bibê. Xort amade bûn ji bo xizmetê. Dixwestin xwedanmalîya wan baş be.

Li baxçê dibistanê hazirî xelas kiribûn. Armanca berpirsîyara ew bû,

komela gund, muxhtarî û gundî bi hev re kar bikin û yekitîya xwe xurt bikin.

Ji nivro şûn de mêvan û gundî li ber derîyê dibistanê hatin xerhatî kirin. Qaymaqamê Kuluyê Ahmet Cengîz, serokê beledîya Kuluyê Ahmet Yıldız, Müftü û komeka mezin mêvan ji qezê hatibûn. Ji gûndên dor-paş Şereflîyê jî mêvan hebûn.

Di destpêka merasîma vekirina konaxê, memûrên mêvan dest bi merşa netewî ya tirkan kirin. Di wir de hiseka acêb hate min. Însanên me yên ji Ewrûpa hatibûn şaş bûbûn. Merşa tir-





kan nedizanîn. Destpêka mêvan xêrhatinkirinê de hevalbendiyeka germ û sohbeteke xweş hebû lê niha piranîya gundîyan şaş ma bûn. Kesî xwendina merşa tirkî nedipa!...

Di dengkirinê de qaymaqam û mêvanên din dilxwaşiyên xwe anîn zimên. Konaxa gund, tehmîra dibistanê û pirtûkxanê pir kefxweşî de insanan. Di pirtûkxanê de 450 pirtûk he-

bûn. Dem dema xwendinê bû. Însanên gund bê pere dikanîn pirtûkan bixwînin.

Ji merasîmê şûn de herkes çû hundirê dibistanê. Xwarina hafî hazirkirî hat dayîn. Mêvandarîya kultura kurdan xwe merand. 500 kesî xwarin xwar û bi demeke şûn de mêvan ji gund çûn.

Gundî hîn nêzikê hevdû bûn û heyecan derbas bûbû.





Şivan Perwer bi koma xwe ve di şeva Xelikên Jêrîn de

Li Hattingenê şahî ya Xelikan

Xelikên Jêrî (Gölyazi) li bajarê Hattingenê (Almanyê) ji bo şahîya pişgirî ya Gölsag (Ewropa) di 28ê Gulana 2005an de hatin cem hev. Ji welatên Ewropa wek Hollanda, Swisre, Fransa, Avusturya nêzîkî 500 kesî beşdarî şahîyê bûn.

Şahî bi silavkirina mêvanan û piştî çend helbestên bi kurdî hatin xwendin dest pê kir. Ji wê şûn de li ser navê Gölsagê Bilal Akarsel, li ser karên ku heta îro kirin û projeyên xwe yê ku dixwazin bikin, axaftinek kir. Li ser

giringîya yêkitîya gundîyên Xelikan li Ewropa ditînen xwe anîn zimên.

Serokê belediya Xelikên Jêrî, birêz Molla Şimşek jî beşdarî şahîyê bû û ji bo şahîyê kêfxweşiya xwe anî ziman. Molla Şimşek gazî gundîyên xwe kir ku ew xwe ji bîr nekin, gundê xwe jî bîr nekin ji bo ku rewşa aborî li gund baş bibe, dewlemend û kar-saz li gund vegezin û cîyê kar vekin ku gundî, gundê xwe terk nekin, nerin derve. Piştî Molla Şimşek, wek mêvan rewşenbîrê kurdên Anatoliya Navîn

Nuh Ateş axaftinek kir. Nuh Ateş li ser serhewdê Xelikan û Mihina Xelikan a bi nav û deng axaftineke balkêş kir. Birêz Ateş peşnîyazîya serokê belediyê Molla Şimşek kir ku heykeleke Mihîne wek sembol li Xelikan çêke. Bernama ji bo zarokan jî pir baş bû. Palyaço bi zarokan re sohbet kir û bi lîstikên xwe ew şad kirin.

Li ser navê komela ziman Yusuf Polat ji Axaftinek kir. Polat li ser girîngiya Zimanê zikmaki axaft û gazi kir ku em bi kurdî dengkin, bi kurdî bixwînin û bi kurdî binivîsîn. Kesên wek Mehmet Bayrak, Rohat Alakom, Yusuf

Yeşilöz bi mesajên xwe pişgiriya xwe anîn zimên. Her du kovaren kurdên Anatolîya Navîn Bîrnebûn û Veger bi mesajên xwe û bi xwe di nav şahîye de bûn.

Bername di beşa çandî de, bi koma Baran, Xelikanli Ahmet û hozanê kurd yê bi nav û deng Şivan Perwer bi kîlam û dîlana kurdî heta saat 00.00 şavê berdevam kir. Ji bo ku ev organîza yekemîn bû di ware organize de kêmasi hebûn. Xelikîyan bi hevîya organîzeyên hîn baş, xatirê xwe ji hev xwestin û bi dilşahî vegerîn malên xwe.




Serokê belediyê Molla Şimşek

Hevpeyivînek bi mamoste Îsmâîl Beşîkçî re

Birêz Îsmâîl Beşîkçî, hûn wek civaknas û rewşenbîrekî tirk ji demeke dûr û dirêj ve ye ku li ser doza kurd dixebitin, lêkolîn dikin, ji ber van lêkolîn û berhemên we, hûn bêhejmar car hatin girtin, bi salan di girtîgehan de man û we lêdan û êşkence dîtîn. Li Tirkîyê ronakbîrên wek we gelek kêman. Loma hûn bala xwendevanên me yên nîfşên ciwan dikşînin û ew meraq dikin ka hûn kî ne; hûn dikarin xwe bi kurtahî be jî, hindek bidin nas kirin. Dema xortaniya xwe, we kurdan kengî û çawa nas kir?

— Di navbera salên 1950 û 1960an de li Fakulta Zanyarî ya Polîtîk bi navê "Staja dîroka xwemalî" programek hebû. Ev program ji bo xwendekarên ku ji polên sêyem derbasî polên çarem dibûn, dihat pêkanîn. Ev program di mehên havînê de pêk dihat. Mirov dikare bêje ku ev ji bo stajeriya xwendekarên ku dê bûbûna qeymeqam bû.

Ez jî beşdarî vê programê bûm û di havîna 1961ande çûm Xarpêtê (Elezîzê).



ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ di sala 1937an de, li Bajare Çorumê, li qeza Îskîlîpê hatiye dinê. Ew di 1962an de ji faqulta siyasî mezûn û sala 1964an de li universita Erzurumê bûye asistan

Î. Beşikçi bi lêkolîn û nivîsên xwe yê li ser kurdan tê nasîn. Ji ber van xebatên xwe 16 sal di zîndanê de maye. Hemû li ser hev 100 sal cezayê zîndanê û 10 milyon TL yê berê, ceza lê hatiye birîn. Bêşikçi di sala 1999an de bi guhertina qanûna tirkî serbest bû.

Ji 36 kitêbên wî 32 hatine qedexeyê kirin.

Ez li şaroşkên (qezayên) Keban, Dep (qereqoçan), Palo, Baden, Baskil xebitîm. Ez cara pêşî li wir rastî kurdan hatim. Min li wir dît ku gundiyan ku karê wan diketin ba qeymeqam bi riya tercûman daxwaz û giliyên xwe pêşkêş dikirin. Qeymeqamên

ku bixwestana bi gundiyan re têkilî dayîne dîsa bi riya tercûman karê xwe dikirin. Tercûman jî di dem û dezgehên dewletê de çayger, memûr an jî beqçî û xizmetkarên dewletê bûn. Halbû ku di sala 1960an 27ê Gulanê de dema destwerdana eskeriyê de propagandayek hebû, dihatin gotin, kurd bi eslê xwe tirk in û bi navê kurdî jî zimanekî tune... Ev propaganda li zanko, çapemenî, partiyên polîtîk di dem û dezgehên dewletê û yên sîvil û civakî de bi awayekî xurtî dihatin kirin. Lêbelê wek min hinek berê jî got, di pratîka jîyanê de weha nebû û dijberiyê mezin hebû. Vê dijberiya han bala min kişand. Dibe ji vê yekê be ku daxwaza lêkolîn û lêgerînê bi min re peyda bû.

Piştî ku min fakulteyê qedan, wek alîkarê qeymeqam (memûrê maiyetê) min dest bi kar kir. Ev jî ji bo qeymeqam stajeriyek bû. Di nav salên 1962-1964an de min wek hevser eskerî kir. Min eskeriya xwe li Bedlîsê kir. Di dema eskeriyê, di sala 1963an de ez li herêmên wek Başkale, Yuksekova, Şemzînan mam. Di wê demê de, ez li nêzêkî sînor bûm û di pêşengiya Mele Mustafa Barzanî de li Îraqê serhildana kurdan hebû. Ez rastî kurdên çekdar hatim.

Piştî eskeriyê di sala 1964an de min li Erzeromê li zankoya Ataturk, li fakulta Fenê wek asîstan dest bi kar kir.

Wek tê zanîn cih û herêma Îskilîp û Çorumê ciyê ku tu li wir bûyî û li

wir mezin bûyî, kurd jî hene. Di wê demê de te kurdên wê herêmê nas dikir û têkiliyên we û wan çawa bû? Di derheqê kurdên wê herême de qet zanîneke Te heye ku ew çawa û kengî hatine û li wir bi cih bûne?

— Li herêma Çorumê wek li Îskilîp, Ortakoy, Kargi û derûdorê kurd hene. Di navbera Çorum û Îskilîpê, li ber çemê Kizilirmaqê ango li navrastê kurd hene. Zanîneke min ya ku kurd kengî û çawa hatine van deran tune ye. Tê gotin ku bi sed salan in kurd li van deran bi cih bûne. Li ser kurdên vê herêmê lêkolîneke min, xebateke min tune ye. Ez di vê mijarê de kovara Birnebûnê dişopînim.

Di van 20 salên dawî de ji Kurdistanê ber bi metropolên Tirkiyê ve koçberiyê mezin dest pê kir. Vê koçberiyê problemeke mezin bi xwe re afirand, li gor dîtina Te Tirkiyê li vê pirsê çawa dinêre û dinirxîne?

— Koçkirina ji Kurdistanê ber bi metropolên Tirkiyê ve polîtîka dewletê ye. Ev ji 80 salan ve heta niha dewlet bi zanîn û plankirî dike. Armanc valakirina herêmên kurdan û paşdaxistina herêmê ye. Di van herêman de wek nimûne dixwazin pêş li pêşveçûn û xurtikira îndustriyê bigrin. Li cihên pêwîst fabrîkên pêwîst nehatina damezrandin. Çêkirina bendavan (barajan) pêş li kişt û kal (ziriatê) girtîye û nehiştiye ku bi pêş bikeve û xurt bibe. Rê ne ji bo ekonomiyê, ji bo eskeriyê hatine çêkirin. Ji ber van sedeman nifûs ber bi rojava

ve bar dike. Ev polîtîka bi zanabûn tê meşandin. Plan û hesab dikin û koçberiya ku ber bi bajarên metropolên Tirkîyê ve dibe, di demeke kurt de tên asîmîle kirin û kurd dibin tirk. Koçberiya kurdan a ber bi bajarên rojava ve problemên civakî jî bi xwe re derdixin holê. Kêmasiya rê, kanalîsasyon, komunîkasyon û karguzariyên bingehîn û pêwîst, bijûndarî, perwerde û hwd peyda dibin. Mal û xanî dîtin promlemeke mezin e. Mafiya ersan, şebekeyên sûç, genîbûna hawîrdor û deryayan û hwd derdikevin. Ev problem weha hemû dikevin ser mil û stûyê şaredariyan an jî weha tê fêhm kirin. Koçberiya bi zorê polîtîka dewletê ya ku xwediyê armanca helandina kurdan e.

Di derheqê kurdên Anatoliya Navîn de mirov rastî çavkaniyên fermî kêmtê. Di vê mijarê de xebateke Te, lêkolîneke Te heye? Hûn di derheqê kurdên Anatolê de çi difikirin?

— Li Anatolya Navîn, Qonya, Enqera, Eskîşehîr, Qirşehîr, Çorum, Çanqirî, Qayserî ez dizanim ku kurd hene û li wir dijîn. Li Qonyayê, li Cihanbeylî, Qulu, li Enqerê Haymana, Bala, Ş.Qoçhîsar, li Qirşehrê Çiçekdagi, Kaman û Poztepe(ji derî navenda qezê hema hema piraniya gundên wê kurd in), li Çanqiriyê Qizilirmak, li Qayseriyê Sariz hwd kurd hene. Li van deran hinek cih hene ku kurd bi serê xwe ne an go piranî kurd in. Li ser kurdên van herêman lêkolîn an jî xebateke min nîne.

Birêz Beşikçi, heger hûn rewşa kurdan a salên 1970î û ya niha bidin ber hev gelo tabloyeke çawa derdikeve holê?

— Heger mirov 1970î bi îro re bide berhev, mirov du tiştî dibîne. Ya yekem pozîtîv e. Mirov dikare weha bêje: Di 1970î de înkariya kurd û kurdî hebûn, tiştêkî weha tune ye, digotin. Îro kurdan xwe fiilî dane pejrandin. Îro êdî kovar, rojname, pirtûkên bi kurdî derdikevin. Lêbelê îro mirov dikare weha jî bibîne: Di van 20-25 salên dawî de fedakariyeke mezin, têkoşîneke bêhempa hatiye dayîn. Li gor vê fedakarî û têkoşîneke weha destkeftî gelek kêmtin.

Li Tirkîyê û li Kurdistanê bi salan in ku hebûn, dîrok, nasname û zimanê zarokên kurdan hatine înkâr kirin û axa wan jî hatiye dagîrkirin, hûn wek sosyologekî vê rewşa zarokên kurdan çawa dibînin?

— Li hember vê pirsê we, ez jî ji we bipirsim. Zarokên kurd ku, “bi salan in hebûna wan hatiye înkâr kirin, dîrok, nasname, ziman û axa wan ji wan hatiye girtin” mirov çawa dikare van hemûyan bi dest bixe? Bajarekî wek Diyarbekir “kurd e” dibêjin li gelek derî, li gelek cihî, wek nimûne li qahwexanan, otêlan, aşxanan, kuçe û kolanan, li çarşiyê zêde dengê tirkî tê bihîstin, dibêjin. Gelo ev zimanê ku ji zarokên kurd hatiye dizîn careke din dê çawa bi dest bixin û ji bo wê çi were kirin? Lêbelê wek nimûne, li Tavşançali, Golyazi(Qulu, Cihanbeyli)

li Anatoliya Navîn deverên ku kurd lê dijîn, li bazarê, kuçê, kolanê, xwarinxanê û li otêlan mirov bêtir rastî axaftina kurdî tê.

Îro li Tirkîyê, li ser pêvajoya demokratbûnê gotûbêjek heye û dibêjin ku ev hêdî dimeşe, heger di dawiyê de li ser krîterên Kopenhagê peymaneke sîyasî pêk were, li gor we heta nasname û helwesta karbidestan neye guhertin, kurd dikarin di zemîneke huqûqî û sîyasî de tam werin temsîl kirin?

— Gelek zehmet e ku Tirkîye bikaribe Krîterên Kopenhagê bi kar bîne. Tirkîye ne ji bo pêkanîna van krîteran, ji bo ne pêkanîna van krîteran hewl dide, xebat dike. Dixwaze nîşan bide ku van krîteran bi cih tîne. Di vê mijarê de him Tirkîye û him jî Yekîtiya Ewropayê hev dixapînin. Herdu jî li hember hev polîtîkayeke durû bi kar tînin.

Dema Tirkîye di qanûna xwe ya bingehîn an jî di qanûnên xwe yên din de guhertineke biçûk dike, wê demê Yekîtiya Ewropa pesnê wê dide û dide ku êdî nayê gotinê. "Tirkîye di warê demokrasîyê de gavên mezin davêje..." Balê dikşîne ku Tirkîyê krîteran bi cih tîne. Lê wek nimûne dema parlamenterên Yekîtiya Ewropa tîne û şaredariyên DEHAPê zîyaret dikin, Tirkîyê reaksiyoneke tûnd nîşan dide. Ji wan re dibêjin, "li wan deran çî karê we heye, çîma hûn naçin Yozgat û Balıkesirê û diçin van deran? Ew şêl û helwesta Tirkîyê qet bi nixên

Yekîtiya Ewropayê yên ku piştgirî, alîkarî, wekhevî, mafê mirovan hene, nakeve û li dij van prensîban e.

Wek hûn dizanin di van salên dawî de, li deverên ku kurd lê dijîn asîmîlasyonê bi lez û xurt kirine. Îro kêma zarokên kurd bi kurdî dizanin. Heta mirov nikare li hinek herêman zarokên ku bi kurdî deng dikin bibîne an jî rast were. Li gor we, ev komkujiyek(qetlîamek) e, an na?

— Em dikarin ji vê re bêjin komkujiya zimanek e. Lê aktorên vê pêvajoyê aliyek jê kurd bi xwe ne. Îro çîma piraniya zarokên kurdan bi zimanê xwe napeyivin? Di vê mijarê de çîma daxwaz, hewez û kelecaneke(heyecan) wan tune?

Hûn îro ji aliyê helwest, şêl, rewş û hebûna sîyasî ve bizavên(rêxistinên) kurdan çawa dibînin?

— Şêl, rewş û helwesta bizavên kurdan ên ku îro hene qet ne baş e. Ew ne xwedî program in û ne jî xwedî kelecaneke in.

Li gor we, ev peşketinên li Başûrê Kurdistanê, dê li ser herêmê bando-reke çawa bike?

— Li Başûrê Kurdistanê gelek pêşveçûnên pozîtîv hene. Dîtin û helwesteke kurd a "Iraqeke federal û demokratîk" heye. Dema kurd vê dîtin û helwesta xwe bi birêvebirîya Iraqê bidin pejrandin bi gotineke din heger vê dîtin û helwesta xwe di qanûna bingehîn de bi cih bikin, wê demê dê kurd

destkeftineke mezin bi dest dixin. Ev bi tenê ne ji bo kurdên Başûr, herweha bi giştî li Rojhilata Navîn ango kurdên li Îranê, Suriyê, Tirkîyê û di heman demê de dibe destkeftina kurdên li Kafkasan jî. Bi baweriya min dê ev proses weha bi pêş ve here. Bi hebûna sîstema federalî re helbet dîyarkirina sînoren federaliyê jî girîng e.

Birêz Îsmâîl Beşîkçî, heger destûra Te hebe, ez dixwazim pîrseke taybetî bikim: Gelek carî ji bo Te ji derî welêt dawetîya hatîne şandin û xelat dane Te. Bi qasî ku em dizanin Tu naxwazî derkevî derî welat û xelatên ku dane Te heta niha negirtiye. Gelo Tu dikarî di vê mijarê de piçek me serwext û agahdar bikî?

— Di vê mijarê de wek te got, tiştî ku ez bêjim û lê zêde bikim tune.

Birêz Beşîkçî, heger mesajeke Te, gotîneke Te ji bo xwendevanên kovara me Bîrnebûn hebe, kerem bike!

— Kurd divê li Rojhilata Navîn di zanebûn û helwestgirtineke wek cîranên xwe yên tirk, ereb, fars, ermenî, suryanî de bin. Îro dema mirov ji kurdekî normal bipirse ka hejmara kurdan li ser ruyê erdê çiqas e? Kêm zêde “40 mîlyon” dibêje. Çima nav, cih û tîkilyên 40 mîlyon kurdî di qata navnetewî de tune? Bipirse, bersiveke rast û durist naye dayîn. Çima navê 40 mîlyonî di Yekîtiya Netewan de, Konseya Ewropayê de, di Rêxistina Hevkarî û Ewlekariya Ewropayê de,

Konferansa Îslamê de, di Rêxistina Pêşketina Îslamê de tune? 204 dewlet beşdarî olîmpîyana 2004a li Atinayê bûn. Nifûsa gelek ji mîlyoneke kêmîtir bûn. Dewletên ku nifûsa wan ji 5 mîlyonî kêmîtir bûn 60-70 dewlet hebûn. Hinek dewlet hebûn ku nifûsa wan ji 50 hezarî kêmîtir bûn. Gelek ji wan dewletan mezinahiya axa wan bi qasî qezayeke Kurdistanê tunebûn. Wê demê pêwîst e ku kurd bizanibin ka çî kar û wezîfe dikeve ser milê wan. Wek nimûne Luksemburg dewleteke endamê Yekîtiya Ewropa ye. Nifûsa wê nêzîkî 450 hezarî ye. Li Yekîtiya Ewropa biryarên “em li Roj hilata Navîn li dij dewleteke kurd a serbixwe ne” “Em li Rojhilata Navîn li dij guhertina sînoran in” digrin. Li bin van biryaran înzeya Luksemburgê jî heye. Ma di vê rewşê de, Luksemburga ku nifûsa wê 450 hezar e biryar li ser çarenûsiya 40 mîlyon kurdî nade? Li vir bêadaletî tune? Ma di van tîkîliyan de exlaqê sîyasî heye? Ev dijberî çima wek brûskekî li serê kurdan naxe û jê zingînî dernaxe. Nîzama navnetewîya salên 1920an çawa ye, weha bê dadî û bêbavîyekî mezin li dij kurdan damezrandine? Di vê rewşê de gelo tişt nîne ku kurd bêjin? Çima di nav kurdan de ronahiyeke berbiçav çênabe?

Li ser navê xwendevanan em pîr spasiya te dikin ku te wexte xwe ya giranbiha ji me ra veqetand, em li benda berhemên Te yên nû ne.

Xwîna me yek e!..



Li ber şaredariya Încovê

Germa havîne, li ber belediya Încovê re derbas dibûm, dora 20 kesan bi kom kom rûniştine. Lê eşkara bû ku ew xerîb û piştîvan (hemal) bûn. Piştî silavê xwe, ez li nav wan rûniştim. Bê guman bi dilşabûnekê, li dora min civîn. Ku min xwe bi wan naskirin dida di şewqa çavên wan de hevaltî û dostanî hebû.

Xwendevanên delal, werin em van pîştîvanana bi hev re nasbikin.

Halim dest pê tike:

— Hatina me, birayê min î mezin Abdurahman ku li eskerê yekî ji gundî Bulduk naskirinê dest pê tike. Bi rêberî ya wî tê Încovê û piştîvaniyê dike. Dora bîst salan berê. Em ji Diyarbekîrê, Çinarê ji gundê Barê ne. Havînê, dora



Li Încovê piştîvan

çar mehan em dixebitin. Payizê jî vedigerin welatê xwe.

Faysal 15 sal in ku tê Încovê:

— Em ji ber birçîbûnê tên.

Şehmus jî 5 sal in ku li Încovê ye:

— Em serî merî rojê bîst mîlyonan distînîn.

Ahmet 17 salî:

— Ez deh roj in ku hatime, min hîn kar nedîye.

Xatip 10 sal in ku li Încovê ye:

— Em li mehê dora deh-panzdeh roja kar dibînin. Çûn û hatin jî buha ye.

Încov – Konya deh milyon, Konya – Diyarbekir çelûpenç, Dîyarbekîr - Çinar Barê ji sê milyon.

Şehmus:

— Gundê me Barê dused mal in. Îdarê me bi Încovê dibe. Sê sed zarokên me diçin dibistanê.

Fahsal:

— Em ji birçîya dimirin. Deh zarokên min hene, yê mezin diwazdeh sali ye.

... naxwaze navî xwe bide:

— Di nav kar de me nasdikin. Lê ku işê wan bi me qedî, me nasnakin. Me li ber şaredarî qebûl nakin. Me dişinîn

aliyê sanayiyê. Ew dera ji vir ferq e û cihekî bi sî jî tune.

Nebî:

— Ez li vir roje bîst û pênc mîlyon distînîm. Lê em li welatî xwe bûna dê rojê me deh mîlyon bista. Va ciha ji bo me ji cihe din baştir e. Ji bo ku bi van re xwîna me yek e. Xwîn xwîna me hevdu qebûl dike.

Fîkret:

— Tu pêlavên lingên min nabînî çawa qetîne. Bi vê pêlavê em ê çawa herin nav Yekîtiya Ewropa? Deh zarokên min hene. Lawikê min ê mezin Osman ji ber xizanî piştî ortaokulê neçû dibistanê û dest bi kar kir.

Em tixwazin zarokên xwe bidin xwendin. Keçik be jî em ê bidin xwendin. Tesîra încovê li ser me tesîreke baş e.

Dora deh malan xanî kirîne. Yên din jî xanî girtine. Pênce-şest kes tèn piştîvanîyê dikin. Ji xêrî gundiyan Dare pênce -şest kes jî ji dora Mêrdînê ne.

Li dawiyê xwestinên wan ji şaredariyê ew e ku ciheke mîna kahwexanê lê rûnin hebe. Seroke şaredariyê jî bo sedema aborî nikaribûye cihek ji wan re peyda bike.



Xwîna me yek e!..

Gera serokwezîrê Tirkîyê R. Tayyip Erdogan ya Amedê

Serokê hikumet û yê AKP (Partîya Edalet û Pêşveçûn) R. Tayyip Erdogan di tarixa 12ê tebaxê de çû Amedê û li wir axaftinek kir. Ev gotinên Erdogan ji alîya pirsgirêka kurd niqaşek û „perîyodek“ nû vekir. Serokwezîrê dewleta Tirk, cara yekemîn û li bajarek Kurdistanê, çend di-tinên eşkere li ser pirsgirêka kurd anî zimên.

Erdogan ku heta roja sefera xwe ya Amedê ev pirsgirêk red dikir¹, him polîtîka xwe û ya hikumeta wê him jî ya dewletê heta vê rojê rexne kir, bi gotinên din „revide“ kir. Hemleya Erdogan divê dema pêş tesîr û encamên xwe bimîn e.

Şîkl û naveroka axaftina Erdogan bi gelek kêmasîyan û pirsan ve giredayî ye. Lê ew bûyer ji bo Tirkîyê û kurdan di riya çareserkirina pirsgirêka kurd de gaveke girîng e. Wek tê zanîn, sîyaseta resmî ya dewleta Tirk li ser Kurdan ji 1923an vir de bi navê înkâr û asîmîlekirinê tê ajotin. Heta niha, qet serokwezîr û sîyasetmedarên dewleta Tirkîyê, li hindûr û derwayî welat, hebûna pirsgirêka kurd qebûl ne diki-

rin. Erdogan di vî warê de înkârîfêk û sîyaseteke nû dîyar kir.

Gotin û tespîtên Erdogan yên nû

Erdogan di axaftina xwe de pirsgirêka kurd bi nav kir û wisa got: „Hûn îlle bibêjin „Em navekê bidin“: pirsgirêka kurd ne pirsgirêka beşêkî vî netewî ye, ew ya hemû kesan e. Pirsgirêka min e jî.“ Bi vê mesajê, Erdogan gotîneke tarixî daxist nav sîyaseta Tirkîyê ya kurdan. Eynî serokwezîrê Tirkîyê, berê çend mehan digot ku „Eger hûn nefikirên, pirsgirêka kurd nabe!“.

Niha Erdogan bi xwe dest ji şaşîfî û inkariya li ser pirsgirêka kurd berda. Di hevoka jorîn ya Erdogan de navekokek eşkere ew e, ku ji alîyekê hebûna pirsgirêka kurd tê qebûl kirin, ji alîyê-din jî ve behsa „vî netewî“ tê ziman.

Erdogan di axaftinê de tiştek din jî tespît û qebûl kir: „Li her welatî demên berê xeta bûne. Li her welatî rojên dijar hatine jiyîn.... Ji bo vî, înkarkirina xetayên ku berê hatine kirin, ne gora dewletên mezin e.“ Di bin wan gotinan de rexneyeke giran

li dewleta Tirk tê fam kirin. Serokwezîrê Tirkîyê, Erdogan bila ferq nekirî be jî, bi şîroveyên xwe sîyaseta kurd ya dewletê mehkûm kir. Ev pozîsyoneke protesto ye û ji sîyaseta resmî cudatiyeke girîng pêk tîne. Gotinek din Erdogan vê ditîne tesdiq dike: „Em pirsgirêkan wek tuneyî nahesibîn. Em her pirsgirêk wek realîte qebûl dikin. Em amade ne ku bi van re rû bi rû bibin.“ Ew tespîtên Erdogan bi rastî mesajên nû îhtiva dikin.

Di axaftina li Amedê, Erdogan behsa demokrasîyê kir û çareserkirina pirsgirêka kurd di riya firehkirina demokrasîyê anî zimên. Lê, nehat gotin ku çarçeva ya pirsgirêka kurd û çareserkirina we çi ye? Ji aliyê din, armanca Erdogan ji bo parastina demokrasî û pêşgirtina mudaxeleyan ordiyê di axaftinê de pir zelal bûn: Di mehên dawî de pir berpîrsên ordiyê û derdorên şerxwaz daxwazên xwe li ser kûrkirina şerê çekdarî dûbare kirin. Lê Erdogan û hikumet li dij şer in û dixwazin riya kûrbûna îhtilafê bigrin. Çend nimûne ji bo wan ditînen Erdogan: „Di vekirînen demokratîk de paşve çûyîn tûne.“ „Kesên ku tehemula ditînan nakin, nikarin behsa azadiya ditînan bikin. Kesên ku tehemula azadiyan nakin, nikarin behsa van bikin.“ Dikarin bêjin ku, „Erdogan li hember helwesta artêşê hemleyek kir û bi vê pêngava xwe xwest tesîra artêşê ya li ser sîyaseta qels bike, beşê tevgera kurd ê bin tesîra artêşê de ye, jê veketîne, wext qezenc bike û herweha jî sebêbên artêşê pûç bike“.²

Nakokiyên axaftina Erdogan

Herçiqas Erdogan li ser pirsgirêka kurd û demokrasî tiştên balkêş gotin jî, di axaftina wî de ji pêşî heta paşî nakokiyên mezin hebûn. Berê her tiştê, konseptek Erdogan li ser pirsgirêka kurd tune bû. Erdogan ne bi endamên hikumetê re ne jî di nav AKP de ditînen xwe mînaqêşe kir û konsensûsek derxist.

Di navbera tespîtên Erdogan û pozîsyona organên dewletên yên din (serokdewlet, artêşa Tirk, bürokrasî û hwd.) de cudatîyên kûr hene. Civîna MGK a tarîxa 23ê Tebaxê eşkere kir ku ger û axaftina Erdogan ya Amedê ji aliya pirsgirêka kurd „rûpeleke nû“ venekir. Xuya ye ku sîyaseta kurd ya resmî nayê guhertin. Û mimkûn e, Erdogan jî siyaset û îdeolojiya dewleta kûr berdewam bike û gotînen xwe yên ku li Amedê gotibûn, ji bîr bike.

Erdogan di axaftina xwe de ditînen îdeolojiya resmî gotin û şaşîyên berê tkrar kir. „Prensîba yek dewlet, yek al û yek netew“ disa bû bingehê pozîsyona Erdogan. Bi rastî, di navbera qebûlkirina pirsgirêka kurd û îdeolojiya resmî de nakokiyêke lihevnehatin heye û divê sîyasetmedarên tirk wek Erdogan û raya giştî êdi vî bibînin. Dema ku kurd û pirsgirêkek bi wan re gîredayê realîteye, bila gavên çareserkirinê bînin avetin. Ji bona vê, pêwîst e ku Tirkîyê bi temami ji îdeolojiya resmî dest berde. Ji alî tarîxî, çandî û so-

syolojî nikare bê înkâr kirin ku kurd û tirk du netew in.

Têza „yek netew“ him derew e û him jî şaşitîyeke bizanîn ya resmî ye û sedema yekemîn ya neçareserkirina pirsgirêka kurd e. Gotinên li ser „yek al“ jî demagojiyeke mezin e. Sembolên kurdan yên netewî hene ku ala kurd jî yek ji wan sembolan e. Divê gelê tirk û berpîrsên Tirkîye ji bo qebûlkirina nasnameya netewê kurd û sembolên kurdan amadebin. „Yek dewlet“ heta îro nebû realîte, çima ku xwedî Tirkîyê tenê „netewê tirk“ e. Erdogan û sîyasetmedar û burokratên din yên dewletê divê îradeya kurdan û statûya wan di qanûna bingehîn ya Tirkîyê de bidin qebûl kirin û dewleteke mûstereke çêbe. Ev tê wê manaye ku Tirkîyê û Kurdistanê Bakur bi awayekî nû bê damezrandin.

Erdogan, çend nivîskar û îlmdarên tirk „firehkirina demokrasî“ yan jî „vekirinên demokratîk“ ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd „çare“ û bes dibînin. Ev têz şaş e û pirsgirêkê çareser nake. Belê, demokratîkbûna Tirkîyê ji bo kurdan gelek maf û azadiyên şexsî bi xwe re tîne.³ Lê, gelê kurd di sistemeke demokratîk de jî li Tirkîyê bê statû û bê xwedî mafên netewî ye. Çima ku demokrasî li Tirkîyê pêwîst e lê ji bo rabûna sîyasetê înkâr û asîmîlasyonê ne bes e. Li dewletên demokratîk wek Brîtanya Mezin û Spaniya pirsgirêkên netewî (Irlanda ya Bakûr, Welatê Bask) hîn jî berdewam dikin.

Têza Erdogan û yên din ku çareserkirina pirsgirêka kurd di riya „firehkirina demokrasî“ de mimkûn e, realist nîne û naye qebûl kirin. Ji bona vî, divê di çarçoveya demokrasîyê de hemû mafên kurdan⁴ bîn qebûl û îcra kirin. Pêwîst e ku sistema „Dewleta Komara Tirkîyê“ bê xelandin û ji nû ve çêbe. Di dewleteke yekîtiya demokratîk û hiqûqî de dikarin bêjin, tirk û kurd ji aliyên statû û mafan ve wekhev in. Irak û Kurdistanê Başûr nimûnek ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd li Tirkîyê ye.

Têza „nasnameya raser“ (tirkî: üst kimlik), ku li ser esasiya nasnameya tirk pêk hatiye, ne realist e û ne jî îlmî ye. Ji bo kurdan „nasnameya jêrin“ (tirkî: alt kimlik) hatiya îcad kirin. Erdogan dibêje ku „nasnameya hemwelatê Tirkîyê nasnameya raser e“. Ev gotin jî ji bo statûya kurdan pir tişt îfade nake. Kesên ku van têzan dîyar dikin, guhdariya daxwazên gelê kurd nakin û naxwazin sedemên pirsgirêka kurd yên tarîxî, cîvakî û sîyasî bidin ber çav. Ji aliyê din di vê Erdogan, hikumet û AKP êdi qebûl bikin ku pirsgirêka kurd pirsgirêkeke nawnetewî ye û li gor şertên nû yên Tirkîyê, Kurdistanê, Rojhîlata Navîn û dinê bê analîz û hal kirin.

Pêvajo û encamên axaftina Erdogan

Him hikumet û organên din yên dewletê (parlamento, MGK û hwd.) û him jî raya giştî li Tirkîyê û Kurdistanê, êdi

gotinên Erdogan û pirsgirêka kurd bi şikleke nû dixwazin gotûbêj bikin. Ji aliyê din, aktorên nawnetewî wek YE û YDE dikarin ji vir şûn de li ser pirs-girêka kurd bê sansûr û tirs bi Tirkîyê re biaxifin. Ji bo vê axaftina Erdogan di hindurî Tirkîyê û di platformên nawnetewî de zemîneke nû derxist olê.

Rojnamevan û nivîskarên tirk ji gera Erdogan vir de pir tişt gotin û nivîsîn. Di medya de jî pirsgirêka kurd ket rojevê. Lê, tê xuya kirin ku raya giştî ya Tirkîyê bi piranî pirsgirêka kurd di çarçovaya „terorîzmê“ de gotûbêj dike. Hemû sîyasetmedar û nivîskar êrişê PKK, Abdullah Öcalan û DEHAP dikin û dixwazin navbera wan û kurdên din xerab û kûr bikin. Ji aliyê din partî û şexsiyetên kurd, wek HAK-PAR û A. Melik Firat, ew ku ji bo çareserkirina vî pirsgirêkê federasyon dibêjin, tên rexne û êriş kirin. Di vî warî de nayê pirskirin, dema ku hemû hêzên kurd dijmin, çawa ev pirsgirêk û îhtîlaf bê halkirin? Ma ji bo serokwezîrê Tirkîyê ne şerm e, li Amedê ku nifûsa xwe 1,3 mîlyon e, bi tenê 600-700 kes hatin guhdariya wî kirin? Divê ev mesaj bi cidîyet û aqilî bê fam kirin. Bîr û baweriya kurdan bi gotinên berpîrsên Tirkîyê êdi nemaye!...

Hinek rojnamevan û sîyasetmedar bi êşkere êrişeke nîjadperest û dijminî li ser kurdan dikin. Ertugrul Özkök di nivîsek xwe de bi vekirî gelê Kurd li her çar parçeyan tehdît û rencîde dike.⁵ Partîyên tirk yê din wek ÇP, MHP û DYP jî rexne li gotinên Erdogan di-

kin û dixwazin pêşiya gotûbêjen ku li ser pirsgirêka kurd dibin, bigrin. Sîyasetmedar û serokwezîrên berê yê Tirkîyê wek Süleyman Demirel û Bülent Ecevit li dijî çareserkirina pirs-girêka kurd pozîsyonan diyar dikin. Ecevit bala ordîyê û bandorên din yê dewleta kûr li ser „parçebûna Tirkîyê“ dikşîne.⁶ Wek tê zanin, PKK heta 3yê oktobêrê biryara agirbesta şerê çekdarî derxist. Lê, operasyonên ordiya tirk berdewam e. Ev tê vê wateyê ku: Tirkîyê aştî û çareserkirina pirsgirêka kurd hîn qebûl nake. Li hinek bajarên Tirkîyê êrişên lînç ji aliyê tirkan dijî kurdan pêk tînin ku ev di nav kurd û tirkan de bingeh û riya „dijminatî ye-ke tirk-kurd“ vedike.

Ji organên dewletê, hikumeta AKP û partîyên sîyasî heta rojnamevan û nivîskarên tirk îtîfakê veşartî mawcût e. Ji aliyê pirsgirêka kurd, di navbera wan hêzan de niqteyek mûştêrek heye: qebûlkirina pirsgirêka kurd ji bo parastina dewleta Tirk rîzîkoyeke mezin e û divê di çarçoveya „dewlata ûnîter“ de li çareyan bê gerandin.⁷ Di vî warî de jî têkilîyên bi partî, rêxistin û şexsiyetên kurd re tînin red kirin. Bi gotineke din Tirkîyê di gavên „vekirina pirsgirêka kurd“ de kurdan wek teref û muhatab qebûl nake. Daxuyaniyên serokên beledîyên kurd û rewşenbîrên kurd bê bersiv dimînin. Bangên partîyên kurd⁸ ku çareserkirinê û aştî pêşnîyaz dikin nayên guhdarkirin. Ev bi rastî ji bo berpîrsîyarên Tirkîyê şaşîtiyeke mezin e û astenga çareserkirinê ye. Dîtin

û xebatên hêzên tirk ên demokrat û hevalên kurdan di dema îro de bê tesîr in.

Barê guhertina sîyaseta Tirkîyê berê yekemîn li ser milê kurdan e. Tevgera kurd di navbera xwe de gelek cudatî û pirdengêyan nîşan dide, divê bi pêşnîyaz û xebatên xwe di vî pêvajoyî de roleke mezin bilîzin û bersiv bide. Mixabin, dema ku îro pirsgirêka kurd di rojeva Tirkîyê de cih girtîye û tê gotûbêj kirin, hêzên kurd hin jî

li dij hev in û bê konseptê netewî ne. Bi daxûyaniyên partî, rêxistin û şexsiyetên kurd karên mezin çênabe û dernakeve holê. Bi vî awayî kurd nikarin xwe wek teref û bervêder (muheteb) bidin qebûl kirin. Lewra, divê di navbera kurdên Bakur de konsensûseke netewî û otorîteyeke sîyasî hebe. Ji bo vî, kurd mecbûr in ku di nav xwe de bi awayekî demokratîk û medenî li dor maseyek rûnin û daxwazên xwe tespît bikin.

(Footnotes)

¹ Balkêş e ku Partiya Refah (PR) sala 1991a di serokatîya Tayyip Erdogan de raporek li ser pirsgirêka kurd amade kîrî bû. Di raporê de îflaskirina sîyaseta resmî tê zman û pêşniyarên girîng hene. Binêr: Aydin Bolkan, „Özgür Politika“, 2.5.2005.

² M. Şefiq Oncu, Hemleya Erdogan, www.netkurd.com.

³ Çend salên paşê virda gotina „mafên negatîv“ ketiye rojevê û wek bingêha çareserkirina pirsgirêka kurd tê propaganda kirin. Tevgera kurd divê şaşîfî û rîzîkoyên têza „mafên negatîv“ rast bibînin û bêjin.

⁴ Erdogan bi gotina xwe „cûdatîkirina (dîskrîmînasyona) pozîtîv“ mesajên „mafên pozîtîv“ de. Lê, Tirkîyê di vir da jî bê konsept û sîyaseta e. „Mafên pozîtîv“ jî bo qebûlkirin, parastin û alîkarîya maf û azadîyên gel, kêmetew û grûbên etnîk, olî hwd. tê gotin.

⁵ Binêr vergerîya nivîsa Ertugrul Özkök, „Hürriyet“, 13.8.2005: www.netkurd.com.

⁶ Binêr gotinên Ecevit: www.kerkuk-kurdistan.com

⁷ Hêzên li Tirkîyê pirsgirêka kurd bi temamî înkâr û red dikin bi pirranî hene û tesîra ewan li ser sîyaseta û raya giştî gelek mezin e. Dewleta kûr, „Itîfaka Sêva Sor“, kemalîst û faşîst hwd. cend nimûne ne.

⁸ Binêr PKK, KONGRA-GEL û KKK, www.mhanews.com; PSK, www.kurdistan.nu.

Li peyî nifşeke şoreşgerên bê ziman, nifşeke bi ziman hewce ye

12/7/2005

“Zimanê me hebûna me ye!” Lê me hebûna xwe bi destê xwe talan û wêran kir.

Me dezgehên asimilasyona zimanê kurdî bi destên xwe, bi imkan û mecalên xwe anî mala xwe û zarok û hevalên xwe bi destên xwe asîmîle kir.

Me ne tenê xwe asîmîle kir; me pêşeroja xwe, kulilkên Kurdistanê –zarokên xwe jî wenda kir; kirin tirk!

Me got zarok hebûna me ye, can û malê me qurbana wan be lê me pirtûkeke kurdî ji wan texsîr kir.

Me got Kurdistan di bin nîrê koledari daye; me got dewleta Tirk me asîmîle, ziman û çanda me talan dike; me got bo azadiya gelê kurd û rizgariya Kurdistanê em ê canê xwe fêda bikin lê me nedît ku ji aliyekî din em, xwe bi xwe gora xwe, çala xwe dikolin.

Me got, berê em ji filan partiyê ne, paşê kurd in. Me got berê em sosyalîst in, paşê Kurdistanî ne. Ev formula han mala me, canê me ji me bir û kir gorê.

Me zarok anîn dinê. Navên wan me bi kurdî danîn. Lê me maneya navên wan hînî wan nekir. Bêrivanên me, Bawer û Berzanên me, Beyan û Binefşên me nikarin maneya navên xwe bi hemsalên xwe re bidin fêmkirin, ber ku bi xwe nizanin.

Em şoreşger bûn, em welatparêz bûn, em ketine leca şoreşgerî û piştgiriya Sovyet û Çînê. Me hînbûna zimanê xwe, xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bi paş ve xist, me got piştî şoreşê em ê hîn bin. Di pêvajoyê proseseke ûsa de nifşeke şoreşgerên bê ziman hate holê.

Ji niha şûn de karê me zehmet e, ji ber ku di nav her maleke kurd de, deh kanalên televîzyona tirkan di quncikê de cih girtiye, hûrik hûrik, hurde hurde, giran giran me dihêre û dike tirk.

Pêwîst e bernameyên televîzyonên me ji ya tirkan baştir be û dewlemendên me di vî warî de erkên xwe bînin cih.

Pêwîst e şoreşger û welatparêzen me ji niha şûn de, li Enqerê, Îstanbul û İzmirê mal û xanî, zevî û atolye nekirin, pereyên xwe li ser axa xwe bi kar bînin, da ku du keç û xortên kurd



Zaroyên xwe bi destê xwe asimîle nekin!...

bikaribin kar bikin û mecbûr nebin herin Tirkîyê.

Pêwîst e şoreşger û welatparêzen me yên ku her sal derin Kuşadasi, Bodrum û Antalyayê berê xwe bidin Kurdistanê, gola Wanê, Keban, Dicle û Mûnzurê.

Pêwîst e, berê her tiştî, em bi xwe bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin. Di pirtûkxaneyâ mala me de beşa kurdî jî ya tirkî bêtir bikin.

Pêwîst e weşanxaneyên me jî niha şûn de pirtûkên nîjadperest û ajanên tirkan çap û belav nekin, rûmet û rêza nivîskarên xwe bizanibin û bigrin.

Pêwîst e weşanxane û înstîtûtên me pirtûk û fîlmên zarokan yên hemdemî çap û belav bikin, jî ber ku dema pirtûk

û fîlmên me yên beradayî derbaz bûn û ew bala zarokan êdî nakşînin.

Pêwîst e em bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin wan hîni zimanê xwe bikin û jî bo wan pirtûkxaneyêke kurdî çêkin.

Pêwîst e em, belkî ne li her derê lê li mehkemên tirkan zimanê kurdî bikarbînin û koraja sîvîl giran giran di her alî de pêk bînin.

Û pêwîst e em di nav xwe û tirkan de xeteke qalîn û sor bikşînin, jî ber ku ev xet wê me giran giran ber bi kurdîtiyê ve bibe!

MehmetSahin@t-online.de

Ez li Anatoliya Navîn bûm

»–Em tirkî nizanin. Me xwe dayê benda stranê kurmancî. Em ê guh bi ser kilamadin....»

Bi deh sala şûn de ez wegerîm welêt, ev ji bo min heyecane-ke mezin bû. Me li Ewropa jîyana li welat takîp dikir lê em ne li vir bûn. Dema ez ji welat derketim ji bo jîyana kurdîtiyê atmosfereke germ hebû. Tirs min ya heri mezin, ez ê wê atmosferê bibînim an na bû. Di destpêkê de bibêjim ji bo min, çûyîna min ya welêt kaosek bû. Ez dixwazim çend nimûnan ji xwendewanên kovera me re binivîsim.

Mewlûda bi zimanê dayîka me, kurdî deşta Polatliyê hejand!

Îro (29.7.2005) xweva min nehat, heyecanek di dilê min de hebû. Fikretê me, Dr Mikailî îro li gundê xwe, Mikaila şahiya suneta lawên xwe Berzan Mikailî



û Mîran Mikailî bike. Dawet û şahiy pîr heyecan nadin min mîna berê, lê di wir de tiştek hebû. Ez ê di jîyana xwe de cara sifte bi kurdî-kurmancî mevlûdê bibihîsim. Sibê zû rabûm û li benda Ecevîtê Nurî Malê Hamoyî yaylê rawestam. Dema ew dereng ma telaşa min mezin bû. hişê min çû ser Îrfan Baysal, gerek ew jî ji Hecîlêra bihata û li Yayla Kûtê li petrola Elmecît benda me çavkira.

Dem a Ecevît hat, min got; De bajo! Em bi rê ketin. Li gaza Yaylê Kûtê me dît ku Îrfan bi keçik û xwarziyê xwe ve li benda me rawestayê, me efa xwe xwest û em derketin ser riya Mikaila. Bi deh salan şûn de min rê ji bîr kiribû, ez ketim gumanê, em mecbûr man, me pîrs kir. Gund bi gund me pîrskir, em gehiştin Mikaila.



Mikaîla gundeki kevn e. Li deşta Polatliyê û di dîroka gundên kurdên Anatolîya Navîn de barî xweyê giran heye. Em gehiştin wir, me li kêleka gund du xort dan rawestandî û me mala Fikret pirs kir. Dema rê ji me re nîşan dan, ber me ji hev bû. Li ber malê telaşêk hebû. Jin û mêran xwe dabûn ber siya xênî. Em li ber malê xerhatî kirin û derbasî jor bûn. Qatê jor li oda mêran me dest bi dengkirinê kir. Sohbeta me li ser Mikaîla, kurdên Anatolîyê bû. Hevalekî Dr. Fikret yê hêja bi navê Fikret Zengin, kurdekî zaza û elewî, bi xwe ji Kurdistanê ji bajarê Bîngolê bû. Ew û jina xwe û herdu zarayên xwe ji bo kirivîya zarokên

Fikret ji Almaniyayê hatibûn wir. Me da û stand. Min dît ku hîn heval mîna min bi heyecan in. Min Mele pirs kir. Ew li rê bû, ji Anqerê dihat.

Li derwa telaş hebû. Ji bo xwarin hazirkirinê merivên Fikret diçûn û





Mele Mehmet Çetinyürek Quranê dixwîne

dihatin. Ji bo mêvanan, li der ve ji bo siyê kon hatibûn vekirin. Demekê şûn de em dawetê nan xwarinê kirin. Me şîva xwe xwar û em li nav Mikaîla

gerîyan. Haziriya Mûzikê hebû lê ji mewludê şûn de destpêkirin hatibû organîzê kirin.

Mêvanî hêja Mele, kurdekî Serhedê, Mehmet Çetinyürek ji Anqerê hat û me dest bi bernameya xwe kir. Melê kursiya xwe hazir kir, ji camiya gund jî aletên dengkirinê anîbûn. Melê bi erebî dest bi dua kir. Min li çavê Îrfan meskir ew jî mîna min bi heyecan bû. Zimanê xwendinê hatê nû kirin. Min dît ku melê Qur`anê bi zimanê me dixwînê. Lo bavo va çi yê loo!!! Min cara yekemîn dînê (ol) me bi kurdî bîst. Halahallah ev çi bû loo. Tirkan 80 sala digotin; zimanê kurdî tunê. Walla ez serxoş bûm. Mina filozofê mezin Mevlana ji xwe derbas bûm, ketim zikirê! Li kêleka paytexta Tirkîyê, melêyê hêja bi zimanê kurdên Anatolîyê mewlut dixwend. Li wî gundî, serokê tirkan



Şikeftê li Mikaîla



Dîmenek ji festivala Xelikanê Jérîn

Mustafa Kemal li hemberê dijminê xwe, yewnaniya şer kirîbû. Demeke şûn de hebûna gelê vî gundî înkâr kirîbû lê îro li şûna wan înkariyê, zimanê me, kurmanci li erd û ezmanê Mikaila belav dibû.

Meleyê hêja bêyt jî bi kurmancî digot û dua dikir. Dengê wî mêrî pir xweş bû. 100 kesî zêdetir guh didan ser wî. Min li meriya meze dikir, piraniya wan memnûn bûn. Li ser çavên wan şûna tirsê dilşadî û bextewarî xuya dikir. Dîroka Kurdistanê hat ber çavê min. Ehmedê Xanî, Şex Seîdê nemir, Seyit Rizayê Dersîmî, Qadî Muhamed, Mistefa Berzanîyê mezin û bi hezaran kurdan xwe dabûn rêzê. Dilop bi çavên

min ketin. Dilê min ziz bû û mewluda bi zimanê me kurmancî deşta Polatliyê hejand!

Şahiya dawetê bi zirna birayê Faruk berdewam kir. Li dîlanê sekinin, govend hate kişandin. Meleyê gund jî hat ket govendê. Amadekirina şahiya suneta zarokên Dr Mikailî bi ruhekî kurdî berdewam kir. Lê ez di bin tesîra xwendina mewlûda kurdî de mam. Zimanê me yî xweş, gerek em lê xwedî derkevin, ziman hebûna me ye, bi rastî. Ku ez çûme gundê xwe Celika û deşta Qonyê ez ê ji herkesî rê bêm; ji vê şûn ve êndî tu mewlûda tirkî nedin xwendin! Min li Mikaila bi guhikên xwe bihîst, ew bi kurmancî jî tê xwendin!



Mêvanên di festîvala Xelîkana Jêrîn de

Di şahiya Xelîkan de ruhê kurdî tune bû

Di 30ê Temûza 2005an de, ez û Ecevit ji bo beşdarbûna çalakiya Xelîkan ji gund derketin rê. Demak em nêzikî Saxlixê bûn tesîra Gola Xwê, çoraxbûyîna erdê deşta Xelîkan dest pê kir. Dor aliyê rê kanal vekiribûn, rojê hemû dor aliyê Xalîkan germ kiribû.

Xortên Saxlixê ji bo beşdarbûna festîvalê peya ketibûn rê. Me xwest em çend kesan bigrin araba xwe. Min ji Ecevit re got: Raweste; ez ê bi xortan re bi kurdî deng bikim, eger bersiva min bi kurdî dan em ê wan heynin, lê bi tirki dan dameweste bajo.

Min got; merhaba xortên delal, hûnê herine ku derê?

Yekî got: Em ê herin festîvala Xelîkan.

Yê din got: Gölyazî'ya gidiyoruz, festival var. Min li çavê yê sêyemîn meze kir.

Got: Valla Arabanıza alırsanız yayan gitmekten kurtuluruz.

Ye çaremîn; Rojbaş. Me heynin ya baş bibe!..

Min got; Tu û tu sîyarbin. Lê hûn ne!!! Xort ecêb man. Heneka şûn de çar xortan saxlixê siyar bûn. Li rê me sohbetek li ser zimanê kurdi, rewşa gundan kir. Çar xortên me li Unîversîtê xwandevan bûn. Sê xortan gotin; em ê dest ji fakûltê berdin û herin Ewropê. Xortê ku baş deng dikir sempâtîzanê fikrê Cemaata Nûrcûyan bû. Ye din



Serokê Belediyê yê kevn û yê nû

sempatiya xwe bi sîyaseta kurdîtiyê re hebûn lê esas armancên wan çûyîna Ewropa bû... Em gehîştin Xelikan.

Bi hezaran însan ber bi meydanê şahiyê diçûn. Em jî ketin nav. Li barîkê Jandarman hatin kontrol kirin. Jandarman cilê Robokop li xwe kiribûn. Min xwe di cejna Newrozê de li Silopîyê yan jî li Stenbûle li meşa yek Gûlanê hîs kir. Em gehîştin meydanê.

Havalên ku em dawetê Xelikan kirin me dîn. Ji Ewropa jî pir heval û dostên me li wir bûn. Em çûn standa geriyar, me bi insanan re deng kir. Bernamê dest pêkir, em li hevîya mesajêka kurdî bûn. Spîkerê li ser sahne

bi tirki bername peşkeş dikir. Serokê Belediyê, Serokê Gölsax-Qonya yê, berpirsiyarê DEHAPê û hemûyan bi tirkî deng kirin. Qet yek kelîme bi zimanê însanê Xelikan tunebû. Min va rexne li hevalan kir. Gotin; tu rast dibeyî lê me nikanî!...

Li meydanê şûna vela tune bû. Ji derî Xelikan, ji gundên Cihanbeylî û Kuluyê jî însan hatibûn. Lê li kelaka



Serokê Gölsax-Qonyê



Muxtarê berê

meydanê, çayxane tijî bûn. Însana mînak şahî nedibîstin, *Batax û Okey* dilîstin, ez pir ecêb mam!...

Mêvandarîya hevalan pir baş bû. Kes havalan benda me bernedan. Em hemû mêvan çûn li dervayî Xelikan ciyê petrolêkî, me bi hev re xwarin xwar. Li wir spasîya xwe dikim.

Tesîra dewletê pir zêde xuya dikir. Komita amadekar di bin emirê komî-

serê şahîye de bûn. Kontrola sahne komîser bi xwe dikir. Ez naxazim li ser vê binivîsînim.

Li ba însanan heyecan, daxwaz hebûn! Lê rêber tunebûn li wir. Zimanê kurdî, zimanê însanên Xelîka, bûbû zimanê stranan. Li şahîya Xelikan, kilam bi zimanê kurdî hatin gotin. Naveroka şahîyê vala bû. Dikarîbûn li mala xwe rûnin û kasetek yan jî CD ye ka Dîyar, Serbülent Kanat yan jî Osman Yılmaz guhdarî bikirana!...

Gelo, li ber germa havînê, 2-3 seatan jî bo guhdarî û temaşekirina bernamê kal û pîr, taybetî jî jinên pîr yên tirkî nedizanîn, çi fêhm kirin? Bersiva min heye. Min jî çend jinên pîr pirsî:

Gotin:

-Em tirkî nizanin. Me xwe daye benda stranên kurmancî. Em ê guh bi ser kilamadin....



Jinên Xelikên Jêrîn

BÊ ZIMANÎ Û DÎL-XATÎR

Xwendevanên delal, hûn heta ji dest we hat li gor hiş û fikirên xwe bîryara xwe bidin û bi mêjiyê xwe bitanişin. Hetanî îro, li her karekî min bi gura kê kiriyê, kêngê min bi serê xwe ne, bi serê yêkî din herket kiriyê; tim û tim pêrişan û belengaz bûm. Îsal jî min şaşiyek weng kir. Ji ber wê jî, a ku hatî serê min bawer bikin nehate serê kesî. Hevalan ji min re telefon kirin. Gotin “şevêk me heye tu dikarî werî Stockholmê, em ê kêfxweş bibin. “De rind e. Min jî bi xwe û xwe got; ez ê herim hevalan bibînim, Stockholmê bibînim û bigerim. Ez bi wê dawetê xenê bûm. Ez dora dine royê rabûm. Ji çûyîne re min xwe amede kir. Lê, kêmayek min mezin hebû. Tu zimanê yad min ne dizanîn (Ma di navbera me de be, min li vî welatî dibistana bilind xwendî bû). Roja ez dixwazim birekevim li THY yê bilet tûnebûn, aveke sar bi ser junîyên min de hat. Di teyarên (balafir) yada de ez dizanim ez ê pêrişan bim. Ez di wana mal xulênade wûm. Xalekî minî bi her-tîştêkî dizaneyî heye ku ew hate cem min. (hevalên vî, ku xwe binav dikin

dibêjin “ezî muhasebecime” xalî minî dibê “Ben malî müşavir felan kes” Min hal hakata xwe jê re katkir; “Tu fedî nakî” tu çima zimên nizanî?(Ez î xwe nasnakime evî min hê baş nasdike). Te dibistana bilind xilaskirîye, lê îngiliziya te heye. Bi Lufthansê here. Ez jî du sala berê bi Lufthansê çûm Stockholmê û hatim. Lê, min ji bo zimên tu qar û bar nekişand.” got.

Bi ser wê gotinê xalikê de min çû bilet ji Lufthansê stand. Ez î berê herime Munihe dûwe bi teyyareke din herime Stockholmê. A hûn bizanin ku barê min yêk bû, bû dudi. Her çû tirsaziman nezanîne kete dilê min. Lê, çî ji min re heye xalê minî, min motive dikê. Got; “xwarzê qet metirse. Sala berê, wexta ez çûm, di teyyarê de zikê min êşîya. Min banga hostêsê kir. Min herdu tilîyên xwe yên îşaretê(sinalast) rahev xistin. Dûva min tilîya xwe da zikê xwe û min got; aphoteck (A hûn bizanin î ji hostêsê re gotiyê zikê min eczane ye). Rokê jî, ez û dayîka min li Stockholmê, em li tîranê sîwar bûn. Hetanî ez biletan bikirim kalekî ji omete Îsa çû hêla dayîka min rûnişt.

Min dîsa herdu tilîyen xwe rahev xistin, min etik nîşanda vî li hewa min zanî, bê zimanî ya meriya mîna koda jî bike, mîna kolîya jî. Her ku hostês û min got; *It is my mother.* (vê carê jî etikê kiriyê şûna kodekê). Bi ser wana gotinên xalêkê de min dizanî çî yê were serê min. Lê min bîlet kirî wû. Ez li Lufthansê siwar bûm û ketim rê. dihatin û diçûn û çî dipirsin min go yes, no; Hesê Hewê yî kete bîra min. Hes û hevalaki vî li Kuşadasîye digerîne. Du jinên Îngilizî rastê hatine. Yek ji Hesê re dibêje *"Do you speak English?"* Hesê me jî dibê; *"Yes"* Dûva jî nik bi îngilizî pirseke dûdirej dike. Lê, Hesî tu tiştî fehm nake. Hevalê vî ji Hesê re dibêje; *"Kul, mitik, madem yes tenê wû te ew ji negota."*

Xwendevanên delal li rêwitiya xwe min dît, va ometê Îsê yê dil û xatira nizanine. Wexta ew têne welatê me. Emê xwe ji wana re dikujinî. Şaş diwinî jê re çî bikinî. Ji bo ku ew zimanê me nizanine, ji bo ku ew ji ber me ve fedînekin; em dikevin her rengêkî ji bo ku me fêhm bikin, jê re dengê çûçika jî derdixinî, dengê golika jî. Lê, ew ne mîna me ne. Ne dila dizanine, ne xatira ne jî, mîvantîyê. Ne xema wana bû ez mîvan im, ez xerîb im, hûn jî ji min re îkramekî bikin tobe!... Nîvê şevê ez ji xewê rabûm, em hê li hewanê. Lê, dilê minî cixarekê dixwazê. Xwastineke bê tarîf. Dizanime teyyarê de cixara

kişandin qedexeye. Min bibaxşînin, ez rabûm çûm rêya destavê, tuweletê. Li ser derîyê wê jî *"cixare qedexeyê"* nivisandine. Min bi xwe û xwe got; ez mîvanê vana me. Qe neyê ji min re jî bêjine *"cixare qedexe ye"*. Min girt di tuweletê de cixarek vêxist û du-sê nift ji kişandin. Dûva cixare avite tuwaletê û ez bi derkertim, çûm cihê xwe de raketim. Xwedê mala hostesê bişevitîne, nekir nexvar, ê hat ezî ji xewê rakirim. *"Te cixare kişandîye"* got. Ez meriyekî mîvan im, qe ez dereva nakim. Min jî got; erê min kişand. (mîna Hesê min got; yes) Ne fedî ne heya ê sekinî *"Ka cixare xwe bide min."* (Her çiqas deng kirina min tunewe jî fêhm kirinê heye) Min jî cixare biderxist dayê. Bi ser wê de zanî em ji ometê Îsê pêştatir in. Me qet tu cara, ji berîya mîvanên xwe tiştek bidernextîye. Min ziman bizanîya mîvantî çî ye, min ê biber wê xista. Lê çî bikim ziman tune wû!..

Li vejerînî jî li Munihê, hetanî ji terminala G, herim terminala H, min çî kişand ez dizanim. Di 35 deqa de ez ji taqê jêr çûm taqê jor. Li wê navberê min ji çend merîyên mîna xwe yên serreş pirskir, ka tirkî an jî kurdî dizanine. Kesekî min fêhm bike, raste min nehat. 35 deqa şuva ez gêhiştim ber peron, xwedê mala wana bişevitîne, li tirka digerî, li kurda digerî mîna xwelîyê li ber peronê kombûne.

Ez, serê we neêşînim, dema ez li Stockholmê peya bûm, tê bêjî qey ez carek din hatime dinê. Min dît heval giştik bi kurdî deng dikine. Bawer bikin tirkî ya min dizanî jî, ji min re zêde hat. Meriv bi ziman bû carek din tê dinê. Ez danzdeh roja li Stockholmê mam. Rojekê min vi hevalê ku ji min re rêberî dikir re got; min biwe mala Qral û Qralîçê. "Keçika me". Em çûn dor û paş malên wana re gerîyan. Lê, qet tu kes nehat li me nepirsî, kesî nehat negot hûn bi xêrhatin û tu çay-qehwe jî îkram nekirin. Ez bi xwe û xwe li xwe xirab bûm. Eceba keçika me û zawa yê me çima vê li min dikine? Tiştêk ji min bihîstin. "Lê, na min ji rêberê xwe re got; Qralîçe neyê kurd e? Got; "na ew te ji ku biderxist?" Min; çima? Lê, Beko di nivisek xwe de ji bo Qralîçê digot keçikê me. Havalê min; "Tu hişsvikî çî?" qet tiştêkî weng diwe? Ez neyî hişsvik im. Ji gundên me; Germikê demekê çûyibûn gundekî cîran. Elê Kalê anîbûn ji xwe re kiribûn mixtar. Dû wê va navê Germikê bû Elekala. Bi ser nivisê Beko de min bi xwe û xwe got; dibeke ji koçberên me yên zûda hatiyîn Swedê; swedîyan keçek kurda dayîbûn Qrêl û bi me re buyîwûn xi-

sim. Ter mer, mesela ne weng e. Ji bo ku porê Qralîçe û porê Beko herdu ya jî zer e, ji ba Beko, ew û Qralîçe ji malbatekê ne. Mesele weng be jî min li wir jî tu mîvanperwerî, tu dil û xatir nedît.

Xwendevanên delal, ne tenê, ometê Îse, koçberên me yên çûyî li wir bi cîh û war bûyîn jî ketine halê wana. Ên me jî dil û xatir erf û edetên kurda yê ji bîrkirine. Hevalekî min î 30 sal e, ez nasdikim, şevêkê hat ez girtim, birim mala xwe û ez kirim mîvan. Nanê min da min, hurmetekî mezin jî kir. Dûva şîşek şerew jî ji me re vekir. De rind. Heryekî ji me du kupe wehwarin şûva; hevalê ez li malê mîvan, î sekinî "*Memê, hespe gundî me ji hespe gundî we çêtir wûn*" Ezî mîvan im de were ka tê bêyî çî. Min got; na, hespe gundî me yên ji hespe gundî we çêtir wûn. Ne yek ne dudi serî binî şorê xwe "*Memê, walla hespe gundî me ji hespe Xelikan çêtir wûn.*" Min ew gotina tu qebûl nekir.

Min ew li xwe derbaskir. Lê ezî nizanime ez biçîçax ketim xewê. Sibê ez rabûm, hevalê min li ber balgîhê min, hê bi xwe û xwe dibêjê "*Hespê gunde me ji yên hespe Xelika çêtir in.*" Xwendevanên delal de hûn bêjin, vana qet dil-xatira dizanine?

SIYARO DÎNO

Kuda kuda siyaro kuda
Perçema reş di eniya gewr da xuhda
Miriye xelke mirin di male xwe da
Ax li minê li min nemaye
Eze seri xeliya gulî werşiya ye
Li şev nîve şevê dîyar dîyar gerîya ye
Kesî xebra xwedî malîye min nedaye

Mala şexê berî li benê
Heri risandine dane denê
Min bane zeyan kir em herinî hennê
Xwedî mala min gêrbûye hay ji xwe nê
Dûman dûman qala cenazê şewitî dikine
Dibên her perçekê li derekê bela kirine
Xwediyê mala minê şewitî bûye komir
Xweng û bira jî nas nekirine

Ji wê şînê heta vê şînê
Çûçika reş difire semtê xwînê
Xwedî mala min li bira qehr kiriyê
Çûye heta id û erefa nayê diyînê
Bi karkirina birayê xwe qayil nebûye
Çûye çar teqsîda bi hev ra bîne şînê

Herem: Kûtiga /Cihanbeyli
Çavkanî : S. Kanat

HECÎYÊ BUXÎRCÎ

Here Heco tu neyî nasî
Tu yî serqotî bi ningê xasî
Ji qeza Qonyê bi derê
Welle tu ji gîyê xelasî

Riz e riz e Heco riz e
Berfek li kekî min barî qerarsiz e
Î ku kekî min nasneke
Didan zêrinî xwedanê hespî yaxiz e

Çima çima keko çima
Eza li ber kekî xwe dînim mest û şima
Kekî min li ber mirinê ye
Arekî xwe dada bi qayma

Cahîl cahîl Heco cahîl
Terebluskê bi nava xwe de reş û daîl
Elegçîkî bi çar pera
Ji kekî min re bû ezraîl

Çavkanî: Çavuş YAPICI
Herem: Tavşancalı

OY DÎLO

Çiyayê me tev li bayê
Dara şîlan çiçek dayê
Min bi te ve dil girtîye
Huro li şûnê kes nemaye

Oy oy dilo oy oy dilo
Katke katke oy oy dilo
Oy oy dilo oy oy dilo
De bê de bê oy oy dilo

nakarat

Çima seva keçka xelkê
Ez dikşînim derd û kula

Ne zivistan e ne bîhar e
Berf dibare çikas sar e
Min rinda xwe wenda kirî ye
Derdê min bû sed hezar e

Paşîya mala çem û xam e
Yar ji bîra min dernakeve
Î ku rînda xwe wendakirî
Bi ro bi şev ranakeve

Gotin: Gelerî
Herem: Anatoliya Navîn
Çavkanî: S. Kanat

DE VÎRDA

De virda virda virda
Bînê ningê te xu da
Li rinda qe megere
Rindê va ne di vir da

De wema wema wema
Sî daket ser kelema
Ez rinda xwe ramûsim
Xu li enîya wê nema

De wer wêda wêda
Pez li xwêdanê xwê da
Sing û berê te qendîl
Navê min sêvî tê da

De wîra wîra wîra
Şara wê derzi têra
Şar li serî bimîne
Neda ser qorê zêra

Gotîn: Gelerî
Herem: Anatolîya Navîn
Çavkanî: S. Kanat

Hevpeyivînek bi serokê Komela Xelikan- Karacadax (KARAWITT e.V.) birêz Tahsin Demirsoy re

Birêz Tahsin ji bo xwendevanên me bi kurtayî keremke xwe bide nasîn.

T. Demirsoy: Ez di sala 1965an de li Karacadaxê (Xelika) ji dayik bû me. Heta dibistana ortê min li gund xwend. Li Tirkiyê ereba min hebû, min şoferî kir. 15 sal in li Almanyayê dijîm.

Zevicime, bi navên Rêzan, Nîna û Rodî sê zarokên min hene. Karê bazirganîyê dikim.

Birêz Demirsoy, Di destpekê da ji bo Komela we tu dikanî bî kurtayî çî bibeyî?

T. Demirsoy: Navê komela me KARAWITT e.V. ye. Di sala 2000an de li bajarê Wittenê gundîyên me hatin ba hev û komel ava kirin. Komela me resmî ye

Çima navê komela we ne bi kurdî ye?

T. Demirsoy: Komela me navê xwe ji navê Karacadaxê û Wittenê girtiye. Kara û Witt. Karawitt e.V.



Di nav gundîyên we de fikre komel avakirinê yan jî yekbûnê çawa hate hole?

T. Demirsoy: Komel avakirin, fikre sarokê me yê belediya berê, birêz Mustafa Taşçı bû. Di civîneka me ya li Ewropa de behsa sazkirina komelekê kir. Gerekbûna komelê, kar û barê me em dixwazin li wan deran bimeşînin anîn zimên.

Em di bin tesîra wan gotinan de man û me li bajarê Wittenê Komela Karacadaxê (KARAWITT e.V.) avakir. Komela me di navçeya kurdên Anatoliyê Navin de bi alîyê avakirina resmî de gaveke yekemîn e.

Heta niha we çi kar kir û di peşêrojê de hûn dixwazin çi bikin?

T. Demirsoy:

1- Me Malperek amade kir (www.karacadag.de) ji bo gundîyên me, ma bi hev re tekiliyên xwe xurt bikin. Haya xwe ji hew hebin.

2- Endamekî komelê dema ku cû Tirkîyê em insanên xwe yên xizan re alîkarîyê dikin. Pirsên wan ê aborî serrast dikin.

3- Em ji bo projeya belediya Karacadaxê (Halk Eğitimi ve Toplum Merkezi) bi maddî û manevî piştgiriye dikin.

4- Em dixwazin di salên peş me de ji bo naskirina dîrok û tiştên kulturî yên folklorê Karacadaxê pêşangeheke amade bikin. Li wir xali, gelt, ber, mînder, balîf, ter, tûr gore û tiştên ji bo rîsandinê, tewnê pêşkeş bikin. Kinc û cilên insanên me yên berê li xwe kirine û di her merheleyên jîyanê de bi kar anîne, amede bikin. Tiştên ji bo cotkarî û şivantîyê hatin şixûlandine, çekirinê û amadekirinê, koşîya hesp û arabê û h.y.d. li *Navenda Halk Eğitimi ve Toplum merkezi Beledîya Karacadaxê* de.

5- Bi tîkîlîyên M. Taşçı, li Hollanda, ji gundê Celebê dostekî me birêz Mustafa Ayrancı 11 computêr dan me. Me jî li wir çend temîn kirin û bi amadekirina serokê beledîya me yê berê birêz M. Taşçı gehandin lîseyê me. Paşê wan computêrê nû kirin û yên me şandin jî niha li Karacadax Halk Eğitimi ve Toplum Merkezi de ne.

6- Ji bo qalorîfer û hoperlokîrînê, me alîkarî da camîyên me.

7- Di sala 2002an de me ji bo 330 Zarokên li dibistana yekemîn de, 720 pênûs (qelem), 914 defter, 320 jêbir(silgi), 360 pênûstraş û tiştên qirtasîyê, alîkarî kir.

8- Li Karacadaxê nexwaşên rewşa aborîya wan ne baş ra me, ji bo mesrefên tandurustî alîkarî kir.

9- Me li meha Ramazanêda ji 30 Malbatî re alîkarîya tiştên xwarinê kir.

10- Xwandewanên Ûniversitê re me alîkarî (burs) dan û em ê hîn jî berdevam dikin.

11- Ji bo dost beledîye bûyîna Karacadaxê û Wittenê em roleki mezin lîstin. Me navê parka Beledîyê ku li Karacadaxê çekirî, kirê Witten Demokrasi Parkı.

12- Li sala 2004an me dîsa ji bo dibistana yekemîn tiştên qirtasîye û defter alîkarî kir.

13- Deutsche Rotes Kreuz (Kızılhaç) ya li bajarê Wittenê, ji 1000 kinçên kevn û lîstok (oyuncak) bexşandinê me. Li Karacadaxê me ji bo insanên xizan belavkirin.

14- Me 3 (Almanya 2, li Hollanda jî 1) Şewên Karacadaxê çekirin.

15- Li Karacadaxê projeyêk me hebû. Ji bo insaneki me yî xizan me malek çekir. Buha yê we 25 mîlyar in. Xani xelas bû. Komela me û çend xêrxwazan alîkarî kirin û me karê xwe xelas kir.



Malbata ku komelê jê re alîkariya xaniçêkirinê kiriye

16- Em dixwazin li Karacadaxê festiva-
leka Kulturê çêkin.

17- Em dixwazin di salan pêş me de li
Karacadaxê cejna Newrozê bi awakî
resmî çêbikin.

18- Eger Beledîya me cîh bide, em dix-
wazin li Karacadaxê ji bo zarokan parka
lîstikê bi awakî modern çêbikin.

*Ji bo komela we piştgirîya insanên
Karacadaxê hûn çawa dibin?*

T. Demirsoy: Eger em li kar û barê
komelên ji bo aliyê aborî de xizmeta
gundên xwe dikin meskinî yan jî bi-
din ber hev piştgirîya me pir kem e. Bi
dîtîna min gundîyên me bi wan kar û
barên me re alaka nabin. Di projeyên

me de bi tevayî me alîkarî û alaka nedît.
Kêmbûna endamên me jî sebebek e.
Destpekê, ez bawer dikim pêşerojê
de însanên me yên dûr disekinin an jî
wan kar û baran nasnakin piştgirîya
xwe bidin me.

*Di civîn û şahîyên komelê de bi kîjan
zimanê tê dengkirin?*

T. Demirsoy: Civînê em çêdikin
bi zimanê kurdî dibin. Şahîyên em
amade dikin de dengkirinên, min bi
kurdî ne. Lê belê hemû însanên me baş
kurdî nizanin û car caran bi tirkî jî tê
dengkirin.

*Li Wittenê însanê Xelikî pir in. Li
eyaleta Nordrhein Westfalyê heqê*



Tahsîn Demirsoy

hevisîna kurdî (derse kurdî) li mekteba heye, eger dê û bav bixwezîn. Xelikî çima li Wittenê vî heqî naxwezîn û kurikê xwe naşînin dera kurmancî? Karawitt nikane rêberîya vî karî bike?

T. Demirsoy: Li bajarê Wittenê 200 insanên me hene. Lê 6 kes bûnê endamê komelê. Piraniya endamên me ji derwayî Wittenê ne. Ji insanên me peşniyazek weng nehat. Gerek em li mafên xwe xwedî derkevin. Lê quweta me jî tune, wî karî organîze bikin. Me nikanî cîyê komelê biparêzin. Min bi zora xwe demekê, çar sala pêşta bir lê nemeşîya. Niha cîyê me tune ye. Bi rastî piştgirîya insanên me tune, eger insanên me alikariye bidin me, em dikanin pir tiştan çebikin.

*Di dawîye de çi dixwazî beyî, mesa-
jek te heye?*

T. Demirsoy: Gerek di nav me de yekîti hebe. Yekbûna xwe gerek em biparêzin. Nexwaşiyên xwe gerek em cîbîlin. Însanekî me fikrek an jî projeyek peşniyaz kir piraniya me li fikr û projê mesnakê, ji kîjan malbatê? lawê kê? Dewlemend e? Fikrê xwe yê sîyasî çi ye? mêzdikin. Wa nexweşiyeka mezin e. Em gerek bi dostanî û biratiyê li hev meskin. Rexneyên me giran in. Ji bo me, min jî pir tişt te gotin, lê em li vir in û bi quweta xwe dixwazin kar bikin. Ez dixwazim bi riya we banga gundiyan xwe bikim. Werin li komela me bibin xwudî. Bibin endam û em karê xwe zedê bikin. Kêmasiyên xwe bi hev re serrast bikin. Ji bo wê îmkanê spasîyê Bîrnebûnê dikim. Li Bîrnebûnê jî xwudî derkevin. Spas.

Ji bo Tekilîyê:

KARAWITT e.V.

Hardel 34, 58455 Witten / Almanya

www.karacadag.de

e.mail: KARAWITT@web.de

Tel: +49 1729481688

Fax: +02302 913996

Axa û keçika xwe ya bi deq

Cavkanî : Maxbula Qadirî Momikê

Herêm : Celikan-Yeşilyurt

Di wext zemanekî de li zozaneke bi dar û ber axayek hebû ye. Axa bi tevî jin û keçika xwe ya bi deq, di konekê de dijîya ne. Axa, insanekî pir dewletî bûye. Xulamekî ji bo xizmeta wi ya malê û şivanek jî ji bo çêrandina kerîyê pez ragirtîye. Ji hêla din ve, axa însanekî bi nimêj û avdest bûye. Loma jî her roj li dû nimê, ji bo ku xwedê lawikekî bidê li ber xwedê digerîya ye.

Lê roj, meh û salan raserî hev dane, dîsa jî Xwedê lawikek nedaye êxe. Axa ji tirsra ku bi korocaxî di nav sala da here, bi ber xwe diketîye. Heta ku kallekî rûspî di xewnê de jê va xuya dibe. Kalê rûspî di xewnê de bi êxe ra dide zanîn, ku hetanî ew nere mala Xwedê û heca ku li ser wî ferz e neke, Xwedê jî tu lawik-mawikekî nade wî. Dora din ya rê, gava axa bi xwe dihêse, xewna xwe ji jina xwe ra kat dike. Jinik jî bi xevna êxe şad û kêfxweş dibe û dûmanekî tûj ji ser wê radibe. Bi nêzîkbûna dema hecê, axa û jina wî jî hêdî hêdî dest bi hazirîyên çûyîna mala Xwedê dikin. Roja ku axa û jinik bi rê kevin, axa bang li şivanê ber pez dike û jê dixwaze, ku heta ew ji mala Xwedê vedigerin, miqatî mal, milk û keçika

wî ya bi deq be. Şivan jî mîna ku bibê ser seran ser çavan, xwar va tê. Lê di hundirê xwe da, çûyîna êxe û jina wî ya mala xwedê wek firsendekê dibîne, ku keçikê ji xwe ra bibe û girêdayî wê jî ji jîyana şivantiyê xelas be.

Ser wê yekê axa û jina xwe bi dilekî rihet li hêştirên xwe sîwar dibin û tevî xulamê xwe dikevin rêya mala Xwedê. Şivan û keçika bi deq jî demekê bi hev ra terin û tîn. Şevêkê, gava şivan û keçik li ber çira lokizê rûdinin û dikevin mihbeteke kûr, şivan dilê xwe ji keçikê re kat dike. Keçika ku helwesteke weng qet ji şivên nedipa, zewaca bi şivên ra qebûl nake. Hînga şivan li keçikê radighîne, ku eger ew bi dil wî neke, wê çaxê ewê bi darê zorê wê ji xwe ra bibe. Keçika reben jî, ji neçarîyê dest bi girî dike.

Di wê navberê de, rêwîyek di ber konê axa ra derbas dibûye. Rêwîyê ku ji çend rojan virda tiştêk nexwaribû, dixwaze li konê zikê xwe têr bike. Rêwî ji birçîna tu li dor-paş xwe mês nake û bi ser henîyê tere dikeve bucaxa konê û zadê li ser zînîyê dixwe û zikê xwe pê têr dike. Ku rêwî zikê xwe têr dike şuva, mêze dike ku dengêkî bi girî tê guhê wî. Ji meraqa guh dide ser dengê bi girî

ku çî bi ser de; keçîkek mîna xwînê li ber şivên digere, da ku şivên ji daxwaza zewacê vegeerîne. Dilê rêwî bi keçîkê dişewite û dêmîştî girîya wê nabe.

Wê gavê qirarê dide ku keçîkê ji dest şivanê dînreş xelas ke. Rêwî dizikî tê ber derîyê konê, dikeve hundir û par ra xwe nêzikî şivanê li ser pîya dike. Ku hîn şivên ji tiştêkî neanîye der, rêwîyê çavreş çing bi şûrê xwe li stuyê wî dixê, wî ji serî dike. Li dû ji serîkirina şivên, rêwî çexî keçîkê dibe û dibê: „Keçê metirse, tu nêteke min ya xerab tune ye. Gava ez di vir ra derbas dibûm, zikê min birçî bûbû û ji bo têrkirina zikê xwe ketim buxaxa kona we û zadê li ser zînîyê ku hazir bû xwar. Di wê navberê de dengêkî bi girî kete guhê min. Ji meraqa hatim ber derîyê konê û demekê guh da ser dengkirina di nav we da. Wexta ku min ji nêta şivên ya xerab deranî, vijdana min îxaneta wî gotir nekir û min jî ew ji serî kir. Niha jî, ku eger destûra te hebe dixwazim li riya herim.“ Keçîk li hember vê rindîya rêwîyê xerîb xwe deyndar qebûl dike û dixwaze ji hêla xwe ve bi rindîyekê bersiva wî bide û dibê: “Rêwîyê xerîb, ser vê alîkarîya te, ez çî bikim-bibê mî hendik e. Madem tu dixwazî herî rêya xwe, wê çaxê qet nebe ez jî te ji konê derbaskim. Ji xwe hatina te ya hetanî hundirê konê mucîzeyeke bi serê xwe ye, ji ber ku dor-paş wê, ji bîrên kûr tijî ye.”

Cîlê wê deqê keçîk dikeve pêş û rêwîyê xerîb jî dide dû. Bi gavên hûr û mêldar yek bi yek di hêla bîrên kûr ra

derbas dibin. Ku ji bîra dawîyê jî derbas bin, ningê rêwîyê xerîb xûş dibe û dikeve hundirê bîrê. Keçîk jî bi armanca xelaskirinê dixwaze destê wî bigre. Lê, şûna ku rêwî ji ber ketina bîrê xelas ke, ew jî tevî wî dikeve hundirê bîrê. Keçîk û rêwî di hundirê bîrê de mêze dikin, bîr ew qas kûr e ku xelasiyeke bê alîkarî ji bîrê ne mimkîn e. Keçîka xêrnêdî bi vê yekê pir bi ber dikeve. Dev û lêvên wê li hev nagerin ku tiştêkî bibê. Rêwî vê yekê ber da tere û dixwaze keçîkê aş bike. Ser wê rêwî: “Xem neke keçê. Ez dizanim ku te ew yeka nedixwest. Bila ma tu xweş bî. Him, ji vegeerîna dê û bavê te ya ji mala xwedê jî demeke qut ma. Ku çing heye ew ji mala Xwedê hatin, ewê me ji vê bîrê derxin.” Bi umdîya ku dê û bavê keçîkê ji mala xwedê vegeerin, rêwî û keçîk hatina wan dipên.

Çend ro çend şev derbas dibin şuva, dê û bavê keçîkê jî ji mala xwedê vedigerin. Gava tîn ber derîyê malê, mês dikin ku bêdengîyeke xof li dor-paş wê heye. Kerîya wa ji hev belav bûye. Her pezek li derekê mexel bûye. Ji ber bêdengîya xof û ji hev belavbûna kerîyê, axa û jina xwe dikevin tirs û fikara keçîka xwe. Bi lez xwe davên hundirê konê ku çî bavên; şivanê ku keçîka xwe teslîmî kiribûn bi awayekî ji serî bûyî li erdê pan bûye. Gava şivanê li erdê pan bûyî dibînin, wekî ku dinya wan li wan were xwarê xwe şaş dikin. Dayika keçîkê cîlê li wê derê nefes lê teng dibê û bi bîr ve tere. Axa jî bi lez xwe davê der ve. Vir da dipeke wir da dipeke, lê rastî tu rê û rêçeke keçîka xwe nayê.

Demekê bi şûnda axa diweste û emrê dide xulamê xwe, ku here hundirê bîran mêze ke, ka keçika wî te de ye yan na. Xulam jî li gora emrê axayê xwe yek bi yek hundirê bîran mêze dike. Gava tê ser bîra ku keçik tê da, di ser bîrê ra mês dike ku çi mes ke; kêçika êxe di bîrê de ye. Lê li ba wê mêrikekî xerîb jî heye. Xulam bê ku dengê xwe bike, tere cem axayê xwe û jê ra rewzê çing dîbû weng jî jê ra kat dike. Axa radibe ser xwe û tere ser bîra ku keçika wî tê de. Di ser bîrê ra mêze dike û mîna ku xulamê wî jê ra gotibû keçika xwe li ba mêrikekî xerîb dibîne.

Va yeka bi êxe pir bi qar tê. Li gora wî keçika wî êdî neçê bûye. Li hember wê rewzê axa dikeve dubendîyê; gelo bang li keçika xwe bike yan na. Her çiqas axa bixwaze bang li keçika xwe bike jî, tu deng jê der nayê. Di wê navberê de bîrvaçûyîna jina xwe tê bîra wî. Him ji bo ser ra mêskirinê û him jî ji bo ku pê bitanişe, dixwaze here cem jina xwe. Axa bi awayekî stuxwar û şaşbûyî ji ser bîrê vediqete û tere ba jina xwe ya ku di konê de. Axa mêze dike, ku jina wî hîn jî bi xwe de nehatîye. Wê caxê axa bi destê xwe dikute jinika xwe, lê jînik dîsa di xwe de nalive. Axa vê carê ruyê jînikê ber bi xwe ve dike ku çi bibîne; jînikê benz-bet lê reş-hêşîn bûye û tu ruh û can tê de nemaye. Axa li ser wan bûyerên bi êş hişk dibe dadiweste. Di emr jîyana wî de ewqas bûyerên xerab bi ser hev de nehatibûn serê wî. Bi hêvîya ku xwedê lawikekî bibexşîne wî,

çûbû mala xwedê. Lê niha him ji jina xwe û him jî ji keçika xwe bûbû.

Gava axa hinekî bi xwe da tê, tere piştta xwe dide ber dîwarekî û li ser wan bûyerên ku bi ser hev da hatî kûrkûr difikire. Di encam de digihê wê qenatê, ku ji ber neçêbûna keçika wî, êdî ew nikane li ruyê xelkê mêzeke. Loma jî qirarê dide ku tevî xulam û kerîya xwe ya pez, ji wê derê bar ke here welatekî din. Lê bêrî ku ji wir bar ke here, ji xulamê xwe ra emir dike, ku zozanê bi tevî dar û bîrên wê di bin arekî mezin da bihêle, da ku jê tiştêk nemîne. Xulam jî li gora emrê axayê xwe yê salan tev digere. Ji bo ku cîwarê di bin êr de bihêle, qirş û qala berhev dike. Gava xulam qirş û qala berhev dike, dengê wî tere guhê kecik û rêwî. Bi bihîstina dengê qirş û qala, keçik û rêwîyê ku di bîrê de bêhal mayî careke din bi xwe da tîn. Ji wan berê, ku dê û bavê keçikê ji mala xwedê vegeerîyan e û ewê wan ji bîrê xelas kin. Şabûnek dikeve dilê wan. Lê gava xulam qirş û qalên berhevkirî davê hundirê bîrê û êr jî ber didê, mêze dikin ku tu nêteke wan ya xelaskirina wan tune ye. Ser wê re, keçik û rêwî dikin qîreqîr, dikin wêrewêr lê ne axa ne jî xulam tê hawara wan. Berevajî wê, axa tê ser bîrê û bi keçikê ra dide zanîn, ku êdî ji ber neçêbûna wê ew ne keçika wî ye. Dû wê ra, axa bi xulamê xwe va bê ku li paş xwe mêze kin tevî kon û kerîya pez ji wê derê bar dikin, berê xwe ber bi welatekî din dikin terin. Keçik û rêwî

mêze dikin ku arê di bîrê da her ku diçe pêta wê şên dibe. Ji neçarîyê rêwî bi kilamekê li ber xwedê digere:

De bê ewrê biharê şeq e şeq e
Buriska biharê çî bi şewq e
Mêrata alafê gihîştîye
Li xwangê minê bi deq e
Erê xwangê erê xwangê

Ewrê biharê hîm e hîm e
Ê de bi ser ketiye qirş û çîm e
Ê de inşalla bayek xerîb rabe
Xwedê ji min û ji te ra kerîm e
Êrê xwangê erê xwangê

Ku rêwî bi vê kilamê li ber xwedê digere şuva, hûrik-hûrik baranek dibare û arê di bîrê de jî vedimire. Keçik û rêwî bi hêvîya ku zûtir xwe jî bîrê xelaskin û meselê ji êxe ra sererast bikin, qirş û qalên di bîrê de wek dayaq bi kar tînin û xwe jî bîrê xelas dikin. De tu were wê, gava derdikevin derva mêze dikin ku ne axa ye, ne xulam e, ne der e û ne jî dest e. Li zozanê tiştêk nema ye. Wê çaxê rêwî çexî keçikê dibe û dibê: Keçika henî bi deq, bavê te, te ji av ruyê min da te neçê dizane. Bi nêta ku te ji dest şivanê xerab xelas kim, min xwe di vî karî re kir. Min qet nedixwast ku te li ba bavê te, te neçê bikim. Lê niha, li alî ya dinê be jî, ezê li bavê te bigerim,

wî bibînim û jê ra bibêm ku tu dinya axret xwanga min î.”

Dû ra, rêwî keçikê dide dû xwe û ber bi welatekî nedîyar ve dikevin rê. Rêwî û keçik dûr terin, dirêj terin, li deşteke mîna deşta wan ya berê rastî kerîyekê tên. Him ji bo ku vesîna xwe heynin û him jî ji bo ku qultek av vexwin, dixwazin di nav pez re derbas bin û herin ba şivên. Gava di nav pez re derbas dibin, keçik mêze dike ku durîyê vî pezî bi durîyê pezî bavê wê ve yek e. Kecik cîlê di ber guhê rêwî da dibê: “Rêwîyê delal, durîyê vî pezî bi durîyê pezê bavê min va yek e. Ku heye tune ye, va peza pezê bavê min e.

Rêwî: “Keçika henî bi deq, tu qet dengê xwe meke. Ku ew pezê bavê te ye, yan jî ne pezê bavê te ye emê ji şivanê li ber bihêvîsin.” Di wê navberê de şivan wana dibîne û ber bi wan ve tere. Kecik bi rêwî va jî di nava pez ra derbas dibin û ber bi wî ve terin. Li şûna ku li hev diqelivin, şivan wekî ku li ber wî diz- miz hebin, bi dengêkî bilind dibê: “Hûn çi isn in, çi cîsn in ?

Rêwî jî berevajî wê: “Em xwang û birayê hev in. Tî û birçîyê rêya dûr û dirêj in. Ku heye, em xêra dê û bavê te qultek av û parîyek nan ji te dixwazin.” Gava şivan mêze dike ku tu tiştê wan ya diz- mizîyê tune ye, wan wek mîvan qebûl dike. Nan û ava xwe jî bi wan ra par ve dike. Paşê jî dest bi dengkirineke ji dera-deşta dikin, hetanî ku ro tere ava. Bi avaçûna rojê, firsenda ku rêwî li

bendê bû jî tê. Wekî ku bi keçîkê ra birî bû, ji derew-merewa şûna raketina wê şevê dike mane û dibê: "Şivano, ji ber mîvandariya te, xwedê tev îşê te be. Lê belê em îşev şeveder in. Tu dikanî ji me ra şûneke ku em lê rakevin bibînî " ?

Şivan: " Xudanê vê kerîyê axayekî xêrxwaz e. Mala wî jî ji vir nê dûr e. Ku hûn herin serî li wî bidin, ewê li ruyê we mêze ke." Tevî şabûna bi bersiva rêwî ya ligor hesabê wan, keçîk û rêwî xatirê xwe jê dixwazin û ber bi mala êxe ve dikevin rê.

Wekî ku şivên pê mêrandibû, rêwî û keçîk terin û nêzikî mala êxe dibin. Bi nêzîkbûna harima malê mêze dikin, ku mêrikek li ber derîyê wê dawestîya ye. Ku xwe hinekî din nêzikî dikin, keçîk xulamê bavê xwe nas dike û wê jî bi rêwî ra dibê.

Rêwî jî ji bo ku helwesta xulam û êxe bibîne, bi keçîkê ra dibê: " Keçê, tu ruyê xwe bi kitanekê bigre, ku ma te nas nekin û em jî bibînin ka li me çî dikin." Keçîk jî şora rêwî tê dike û bi wî awayî terin ber bi xulamê êxe va terin. Gava xulam rêwî û keçîkê dibîne, cîlê şûrê xwe ji piştê xwe derdixe, dirêjî wan dike û dibê: " Jin û mêrikê xerîbno, di vê şeva reş û tarî da îş û karê we li vir çî ye ?"

Rêwî: "Em ne jin û ne jî mêrê hev in. Em xwang û birangê hev û rêwîyên rêya dûr û dirêj in. Ku destûra te hebe em dixwazin vê şevê li vir rakevin."

Xulam bi gotina wan îna dike, şûrê xwe jî ji nuh ve dike piştê xwe û dibê: "Va mala, mala axayê min e. Dixwaze ku ez herim ji axayê xwe bipirsim, ku wî go erê, ezê we li vir di xewê kim.

Mîna ku gotî xulam tere ba êxe û dibê: "Axayê mino, li ber derîyê malê xwang û birangek ji rêya dûr û dirêj hatî dawestîya ne. Eger destûra we hebe, dixwazin vê şevê li vir rakevin."

Axa: "Ew xwang û birayê ku di vê şeva reş û tarî de xwe şaş kirî çî tewa ne. Here wana bîne ba min . Ez dixwazim wan bibînim."

Xulam careke din çerx dibe tere ba rêwî û keçîkê, û wan heydine dibe ba êxe.

Gava di derîyê xaniyê êxe ra derbas dibin dikevin hundir, axa mêze dike ku xortekî keleş û keçîkeke bi bejna xwe ya zirav ya weke dara çinarê li ber wî dawestîya ne. Gava axa keçîkê dibîne, dilê xwe dikeve keçîkê. Di ber xwe da dibê: "Jina ku ji min ra lawîka bîne, va ye". Axa hînga qîrarê dide, ku keçîkê ji birê bixwaze û dibê: "Ew xwang û birangê ku dixwazin vê şevê bibin nîvanê min hûn in ?"

Rêwî: "Erê axayê min."

Axa: "Ezê we li vir bi nîvan kim. Lê di ber wê, xwestekê min ji te heye."

Rêwî: "Kerem ke axayê min."

Axa: “Ez axayekî dewletî, lê axayekî korocax im. Loma jî bi qewl usla xwedê xwanga te ji te dixwazim”

Ji bo ku bi êxe ra bide zanîn ku xwanga wî keçika wî ye, rêwî di mana kilamekê ra digire û dibê: “Xwanga min qurbana te axa. Lê berî ku ez xwanga xwe bidim te, ji te dixwazim ku tu guh bi ser kilama min.

De bê banî banî axa banî
Ez ketim bucaxa te aslanî
Min sofra goşt û zadê rizê ber xwe danî
Min xwar heta ku zikê min helanî
Erê axa erê axa
De bê merdo merdo dîsa merdo
Serê şûrê xwe xwînê berdo
Wexta ku te ez bi xwangê min va di bîrê da dî nî
Tu dikir min bikujî bi xwangê min bi ser da
Erê axa erê axa
De bê êrî êrî axa êrî
Kerîyên xwe diçêrin kerî bi kerî
Gundo kê ecebê yên veng giran dî ne
Bav li keçikê bû mişterî
Erê axa erê axa

Ku rêwî kilam teva kir şuva, axa dikeve gûmana keçikê. Keçika li ber wî dawestîya yî û lê bûbû xwezinî, keçika wî bû, yan jî ne keçika wî bû. Ar bi êxe dikeve, dest û ningên wî li

hev dipiçkin û dor hev ra çex dibe, wek masîyekî ku av li ser miçiqî be. Di ber xwe da jî dibê: Eger ew keçik keçika min e, hînga dixwaze li ser henîya wê deqek hebe. Ji bo wê jî bi tirs destê xwe radihêle serê keçikê, kitanê ji serî dike û deqa li ser henîya kecikê dibîne. Bi hevdîtina keçika xwe, xuzîya di devê êxe da dimiçiqe. Girî dikeve qirika wî, cirafek dikeve junîyên wî û bi ser

çokan dikeve erdê. Bi dengê dilşewat, wekî ku lêborîna xwe ji keçikê bixwaze dibê: « Keçika min ya delal! Ma ez di erdê reş ketama, min va helawa nexwara. Ser wê re keçik xwar va tê, xwe lê dipêçe û serpêhatîya xwe yek bi yek jê ra kat dike. Gava axa ji devê keçika xwe rastîyê dibihîze, henîya rêwî paç dike û bi daweteke liyaqê mîr û began jê ra li dol-zurnê dixê û keçika xwe didê.

Çîroka min çû matê
Rehmet li vê cematê

TESÎRA BARKÎRINÊ LÎ SER ZÎMANÊ KURDÊN ANATOLÎYA NAVÎN

-|-

Li dervayî coxrafya Kurdistanê, li navika Anatolîyê, pirtir jî li dorûpaş gola xwê komek kurd dijîn. Tenê di nav hûdûdê bajarê Enqere, Qonîya, Qırşehir, Qayserî û Aqsarayê da qasî sêsed gund, qeseba û qeze ên ku nifûsa xwe kurd an jî bi piranî kurd e, hene.

Kurd li her derê Anatolîyê belav bûne û nifûsê wana gîşt tevhev naye zanîn. Tenê nifûsa kurda gundên di nav hudûdê van çar-pênc bajarên ku qala wan li jor hatibû kirin da, çaryek mîlyon e.

Kurdên Anatolîya Navîn xûmalî ne û pirê wana ji du sed salî vir da, li wir bi şûn û war in. Heqê xwe ye, ku meriv wana wekî hendikanîyeke kurd ya ku xwedîyê nîşanên wekî xûmalî, etnîyî, kulturî û coxrafî binav bike. Bireke mezin ji wana ta di dewra osmanîya da, geh bi zorê û li gorê fermanên padşahên osmanî ên di derheqê bişûnkirina eşîrên koçber da, geh jî ber

sedemên din li wê derê bi şûn bûne. Kurdên vê deverê, piranî bi kurmancî, bi sê zaravayê kurdî (kurmancî, zazayî, şexbezênî) deng dikin.

Di tarîxa Kurdên Anatolîya Navîn da, meriv dikane qala du barkirinên mezin û bi bandor (têsîr) bike.

Ji Kurdistanê veqetîn

Cara yekem, birek eşîrê kurdan dused salî di ber vê, kom bi kom ji Kurdistanê barkirine hatine li Anatolîya Navîn ewrîne û bûne xûmalîyê vê deverê. Wana li wira herdên fereh, wekî deşta Cîhanbegî û Haymaneyê bidest xistine û lê gund avakirine. Eşîrê ku hatîne wira li serhev yan jî nêzikî hev mane û her eşîrekê gundek yan jî nêzikî hev çend gund avakirine û navê eşîrê lêkirine, mînak, wekî Omeran, Xelikan, sevkana, Celikan ... Wana di nav xwe de,

van navana bikar anîne û hîn jî bikar tînin. Heta di despêkê da, tirkên cîran jî van navên kurdî, li gorê qeydên zimanê tirkî, bikar dianîn, mînak, Omeranli (Tavşançalı), Halîkanli (Karacadag)...

Mîna vê, wana navê çiya û baniyan, der û deşta jî bi kurdî lêkirine. Nimûne, qasî ku di bîra min de maye, li Xelikan (Qerecdax –Qulu-Qonîya) van navana li cîh û warên wê derê hatibûn kirin: *Korta Bergîra, Korta Hêşin, Gola Çoraxê, Gola Zexê, Neqewa Baxa, Wêza Darê Paça, Wêza Repo, Wêza Malê Mihî Reşê, Kaniya Jêrî, Kanîya Kwîrik, Kanîya Benê, Kana Gilê, Deşta Zwên, Girê Darê, Girikê Malê Mirçkê, Girê Kocê, Çiyayê Înê Gewr, Çiyayê Herşîd, Îna Mehî Ûsiv, Bîra Hûsî Cenê, Bîra Heselmên, Bîra Hesenî Malê Mircê, Fêza Morik, Mexelê Kaşo, Mexelê Malê Hecbekir, Mexelê Malê Hec Reşîd, Çemê Malê Heskê, Baxê Heskî Omer, Hevşîyê Gencê, Hevşîyê Hecê.....*

Rê, mihele, odayê gund jî bi kurdî hatibûn binavkirin. Nimûne dîsa ji gundê Xelikan: *Rîya Tetera, rîya Haymaneyê, rîya Qulekê, rîya kortê Bergîra...Miheleya Jor, miheleya Jêr, miheleya Torinan, miheleya Helaca... Odeya Bulduqî Îdî Osî Qerê, Odeya Hemî Hecî Elê, Odeya Mixtêr, Odeya Bêktêş, Odeya Heskî Îsmeel... Navê kesa, malbat û qebîleya jî bi kurdî tê heldan. Nimûne: *Gula Alê, Mirca Hecê, Eşa Êrew, Zêwa Alûrê, Fata Hemê, Kewa Besê... Hemîdê Qirtê,**

Miçoyê Elê, Bilê Hesê, Şêxê Bulduk, Osê Yixib....Mala Ehmedî Mestê, Mala Hecî, Mala Atikê, Mala Hesekwîrê, Mala Fatê Reşê, Mala Husî Kulik, Mala Mihî Reşê, Mala Elî Bêzê, Mala Husî Kulik, Mala Bêrê, Mala Atikê,.. Kirmita, Surika, Kundira, Oxçîya, Helaca, Torina.....

Wexta ku eşîrê kurda tên di zikê Anatolîyê de diêwirin, bi xwe ra kerîyên pêz tînin. Wana di despêkê da dewara xwe bi pêz kirine. Di hêla pezxwedîkirinê da jî, zimanekî xweş û çê bikaranîne. Çend nimûne: *serê pêz, bira pêz, beran berdan, beremak kirin, dang kirin, bêrî, hoz ajotin, lê banandin, xoşber, fêz, mexel ,hevşo, gom, koz, qolît, dutin, areng kirin, durû kirin, dax kirin, xesandin, mêjandin, beravêtin, pêzan, çêrandin, şevîn kirin.....*

